

## ‘Me digot Hîtler miriye’

**DÎ** jenosîda Enfalê de ku di 14ê Nîsana 1986’an dest pê kir û di 1989’an de li Zaxoyê bi dawî bû de, her bûyer û êrişa dihat kirin ji ya berî xwe mezintir û hovtir bû. Enfal di heman demê de navê şîna herî dirêj ya di dîrokê de ye. **RÛPEL-09**



## Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmancî

**NAYE** ra dime înstîtutî dest bi karanê xo yê taybetîyan kerd û na çerçewede derheqê Kirmanc û Kirmanckî de, derheqê zon û kulturê kirmancan de, derheqê dîrok û sarewedadayişê kirmancan de konferensî, panelî, semînerî dayî. **RÛPEL-11**




## Li Almanyayê dersên Kurdî

**JI** bo xwendekar beşdarî dersa Kurdî dibin, ji dersên xwe yên dinê namînin. Dersên zimanê dayikê dema ku dersên din qediyan dest pê dikin. Dema ku ders qediyan divê xwendekarên Kurd beşdarî dersa Kurdî bibin. **RÛPEL-14**


# bas

HEFTENAMEYA NÛÇEYÎ Û ŞIROVEYÎ
HEJMAR: 16
24 - 30 NÎSAN 2017
www.basnews.com




PROSEYA PÊNGAVÊN AŞITIYÊ S2

# HEWLDANÊN BARZANÎ ENCAM DIDIN

### > DENGÊN ‘ERÊ’ YÊN KURDAN BÛN ROJEV

Piştî referandumê nîqaşên derbarê mijara dengên Kurdan di rojevê de cihê xwe girt. Herwiha Erdoğan jî di axaftina xwe ya piştî diyarbûna encaman bal kişandibû ser dengên Kurdan û gotibû dibe ku ev yek bibe sedema ‘destpêkek nû’.

### > BARZANÎ: EM JI BO ALÎKARIYÊ AMADE NE

Serokê Herêma Kurdistanê piştî ku proseya çareseriyê rawestiya û pevçûnan destpê kir, her tim banga diyalogê li her du aliyan kir û ragihand: “Em piştevaniya proseya aştiyê dikin û em amade ne ku alîkariya her du aliyan jî bikin.”



MURAD CÎWAN >04
Zankoyên li Bakurê Kurdistanê



EKREM ÖNEN >06
Kurdolojî: Ji Rûsya Qeyserî heta îro



NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ >10
Tirkê Almanya û Sîyaset

S3 PARLAMENTERÊ HDPê:



## Divê proseyeke nû dest pê bike

Salên dawîn yên sedsala 21. wê bibin salên Kurdan. Kurd wê bigihîjin mafên xwe yên xwezayî. Kurd erdnigarî jî di nav de, wê mafên ziman û çanda xwe bi dest bixin. 40 milyon Kurd ji hev ne cihê û cuda ne.

S4 PIŞTÎ REFERANDÛMA 16ê NÎSANÊ;



## Ji bo meseleya Kurdî dê gavên nû bên avêtin?

Referandûm bi dawî bû lêbelê gengeşî û niqaşên li ser encaman bi dawî nebûne. Herwiha li ser encamên referandûmê yên bajarên Kurdan jî gelek niqaş hatin kirin û rêjeya dengên ‘erê’ bala raya giştî kişand.

S5 MESUT TEK:



## Encama referandumê û Kurd

Îro xuya ye ku amadekirina destûreke nû, hevdem û demokrat yek ji xalên sereke ya rojeva siyasî ya Tirkiyê ye. Daxwaza destûreke nû û giftugo li ser vê babetê dest pê kiriye û dîyar e ku demeke dirêj wê berdewam be.

## Proseya pêngavên aşitiyê

# Bangewaziyên Barzanî bicih tên



DELAL DIJWAR

**REFERANDUMA**, Pêşnûmaya guhertîna qanûna bingehîn 18 xalên a Pergala Hikûmeta Tirkiye 16ê Avrêlê pêk hat. Di encama referandumê de ji sedî 51 dengên 'erê' hebûn. Piştî referandumê nîqaşek jî mijara dengên Kurdan bû. Dibêjin ku bandora dengên Kurdan li ser encama erê çêbûye. Her wisa di axaftina xwe ya êvara referandumê de Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan jî bal kişandibû ser dengên Kurdan û gotibû dibe ku ev yek bibe sedema 'destpêkek nû'. Erdoğan beriya referandumê çekberdana ETA'yê mînak dabû û di axaftina xwe ya li Amadê de amaje kiribû ku ger PKK dest ji çekan berde dibe ku ji nû ve dîalog dest pê bike.

Her çiqas di sala 2013'an de pêvajoya aştiyê birêve neçûbe jî Kurdistana Bakur ev yek bo aştiyê erênî didît. Lê belê muzakereyên biqasî du salan, beriya 7ê pûşberî sekinîn û piştî hilbijartinê jî şer dest pê kir. Li Bakurê Kurdistanê piştî polîtîkaya xendek û barîkatan yên PKK, qedexeyên derketina derve û şer û pêvçûn bûn sedema rûxandina bajarên Kurdan. ji ber vê rewşê biqasî 1,5 mîlyon Kurd bûne koçber, piraniyên wan merivên sîvîl bi sedan meriv canê xwe ji dest da.

Bê guman şer û nîqaşên di navbera PKK û hikûmetê de herî zêde zirar da Kurdên Kurdistana Bakur. Ji ber ku di salên 2015 û 2016'an de li Bakurê Kurdistanê şerekî giran çêbû. Kurd ji her du alîyan re him bi hêrs bûn him jî dilê wan ji her du aliyan şikest. Dubarekirina Hilbijartinên Giştî, girtina sîyasetvanên Kurd, berdewamkirina qedeyan derve di civaka Kurd de bû sedema travmayê. Kurdan ev qebûl nedikirin û digotin bila dîsa dîalog û pêvajoya aştiyê dest pê bike. Lê belê, di gulana 2016'an de parêzbendiyên parlamanterên HDPê hat rakirin, piştî 6 mehan Hevserokê Giştî yê HDPê Selahattin Demirtaş û parlamenterên HDPê û serokên şaredariyên Agiriyê hatin girtin. Her wisa qayyûm hatin ser şarederiyên DBPê. Ev hemû bûyer pêkhatineke dîaloga nû zehmettir kiribû. Serokê Hikûmeta Herêma

Kurdistanê Mesut Barzanî vê pêvajoyê ji nêz ve dişopîne û gelek caran bangewaziyan li her du alîyan re dike û dibêje ez dikarim bibim 'navberkar'

Ji bilî bûyerên ku li bajarên Kurdan qewimîn li Tirkiyê pêngava derbeyekê çêbû û her wisa pêvajoya guhertina qanûna bingehîn ya pergalê jî destpêkiribû. Di Berfanbara 2016'an de li Meclîsê bi hevkariya AKPê û MHPê biryara pêşniyaza referandumê derketibû. Pêşniyaz di referanduma 16ê Avrêlê de, bi encama ji sedî 51 hat pejirandin. Digotin ku Kurdan piştgirî dane referandumê. Dema ku nîqaşên referandumê berdewam dikir, greva birçîbûnan a ku di 15ê Sibata 2017'an de hatibû destpêkirin, bi bangewaziya KCKê ya 'grev gihîşt armanca xwe' bi dawî bû. Demildest parlamenterên HDPê yên girtî hatin berdan. Tê axaftin ku gerek bandora Kurdan a li ser referandumê, gerek dawîbûna greva birçîbûnê, gerek serbestberdana hin parlamenterên HDPê, ev hemû tişt bangewaziya aştî ya Barzanî wekî ku encam daye.

**Barzani: Em ji bo alîkariyê amade ne**

Serokê Herêma Kurdistanê piştî ku proseya çareseriyê rawestiya û pevçûnan destpê kir, gelek caran banga diyalogê li her du aliyan kir. Barzanî di Mijdara 2016'an de, piştî girtina Hevserokên HDP'ê Selahattin Demirtaş û Figen Yüksekdağ, di hevpeyvîna xwe ya bi BBC yê re eşkere kiribû ku bo alikariya her du aliyan amade ye û wiha gotibû: "Em piştevaniya berdewamiya proseya aştiyê dikin û ji bo vê yekê jî çi ji destê me bê em amade ne ku alîkariya her du aliyan jî bikin. Em hêvî dikin li Îranê jî rêkeftinek di navbera wan de pêk were." Barzanî li ser diyalogê jî wiha axivî bû: "Dema înkara Kurdan derbas bûye û înkarkirina Kurdan sûdekê nagihîne tu dewletan. Kurd jî divê ji bo bidestistina mafên xwe bi hikûmetên navend re bi riya diyalogê û di nava aştiyê de têkiliyan deynin."

**"Divê Demîrtaş bê berdan"**

Serokê Herêma Kurdistanê Barzanî di Sibata 2017'an de beriya serdana xwe ya bo Tirkiyê, dîsa banga vegera proseya aştî û diyalogê, daxwaza serbestberdana hevserok û parlamenterên HDPê kiribû. Herwiha Barzanî ragihandibû ku Erdoğan ji bo çareserkirina pirsa Kurd sekneke bihêz nîşan daye, lêbelê mixabin geşedanên nû rû dan û niha rewşeke cuda heye. Barzanî di her fersendekê de banga vegera ser maseya diyalogê li Enqerê û HDPê dike û tê gotin ku aliyekî di nava HDPê de dixwazin Barzanî navbenynkariyê bike ji bo destpêkirina proseyeke nû.



**Ahmet Türk: Barzanî ya ku ji destê wî bê, dê bike**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî, li Enqerê piştî hevdîtinan civîneke çapemeniyê lidarxistibû û li ser destpêkiririna proseyeke nû jî ev gotibûn: "Ez ji proseyeke nû bihêvî me û hêvî dikim ku dê di demeke nêz de dest pê bike." Şaredarê Mêrdînê yê Berê Ahmet Türk jî ku bi Barzanî re hevdîtinek pêk anîn, wiha axivibû: "Serok Barzanî ji bo Kurdan aktorekî girîng e. Barzanî serokekî Kurdan e û ez di wê baweriyê de me ku wê ji bo proseyeke nû çi ji destê wî bê wê bike." Mesûd Barzanî ku tê çaverêkirin ji bo destpêkirina proseyeke nû roleke aktîf bilîze, herî dawîn li Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan û Serokwezîr Binali Yıldırım geriyabû bi boneya encamên referandûmê pîroz kiribûn.

**'Bangên Barzanî yên diyalogê karîgeriyeke mezin dikin'**

Li Enqere û Hewlêrê tê diyarkirin ku bangên Mesûd Barzanî yên bo vegera ser masê û proseyeke nû karigeriyeke mezin li ser bidawîbûna grevên birçîbûnê û serbestberdana parlamenterên HDPê ku piştî referandûmê pêk hatin, kiriye. Li hêla din doza Hevserokê HDPê Selahattin Demirtaş ku di 4ê Mijdarê de hatibû girtin, dê 28ê Nîsanê bê dîtin. Piştî berdana parlamenterên HDPê Nursel Aydoğan û Meral Danış Beştaş, tê çaverêkirin ku Demirtaş jî di vê rûniştinê de serbest were berdan.





Karîkator ---------- Dijwar Ibrahim

## HDP û Wezîrê Dadê hevdîtinên girîng dikin

Pêşiya referandumê Parlementera Stenbolê û Berdevka Koma Meclîsê a HDPê Pervîn tevlî Parlementerê HDPê yê Enqere Sırrı Süreyya Önder ji bo girtiyên di greva birçîbûnê de di 7ê Nîsanê de bi Wezîrê Dadê yê Tirkiyeyê Bekir Bozdağ re hevdîtînek pêk anîbûn. Buldan û Önder anîbûn ziman ku hevdîtin baş derbas bûne. Buldan û Önder diyar kirin, Bozdağ ji wan re ragihandiye ku di mijara binpêkirinên mafên girtiyan, miameleya xirab a li girtîgehan de bê tolerans in û dê her bê tolerans jî bin. Vekolînên me li ser vê didomin, eger li girtîgehan kiryarên dijyasayî hebin dê bên cezakirin.

## Gava yekem, grevên birçîbûnê bidawî bûn

Greva birçîbûnê di 15ê Sibatê de li girtîgeha Şakranê a Îzmîrê bi beşdarbûna çend girtiyên Kurd dest pê kiribû û li hemû girtîgehên Tirkiyeyê û Kurdistanê belav bûbû. Hevserokê HDPê Selahattin Demirtaş jî li girtîgeha Edîrneyê piştgirî dabû vê grevê, lêbelê piştî 6 saetan rêveberiya girtîgehê daxwazên wî pesend kir û Demirtaş greva xwe bi dawî anî. Piştî referandomê, KCK bang li girtiyan kir û got; Grev gihîşt armanca xwe û ji girtiyan xwest ku greva ku 64 rojan berdewam dikir rawestînin. Girtiyên Kurd piştî banga KCKê greva xwe bi dawî anîn. Her wiha di sala 2013'an de beriya ku proseya çareseriyê dest pê bike di 12ê Îlona 2012'an de girtiyên siyasî greva birçîbûnê dabûn dest pê kirin û bi banga Serokê PKKê Abdullah Öcalan bi dawî anîbûn. Piştî bidawîanîna grevê jî ji bo proseya aşitiyê danûstandin hatibûn kirin. Parlementrê CHPê yê Stenbolê Sezgin Tanrikulu bi neyênî li vê mijarê dinêre û dibêje; Rawestandina van grevan biryarek rast û di cih de ye. Ez lêgerîna mafên siyasî li ser bedena kesayetan rast nabînim.

## Rewş ber bi asayîbûnê ve diçe?

Parlementerê AK Partî yê Diyarbekirê Galîp Ensarioğlu jî, "Bidawî anîna greva birçîbûnê û berdana her du parlementerên HDPê wek destpêka normalîzebûnê dinirxîne." Sirrî Sakikê ku ji hevserokatiya şaredariya Agirî hatibû dûrxistin jî dibêje em li bendê bûn ku piştî referandomê dê parlementerên me bên berdan. Li gor Sakik, berdana parlementeran ji bo vekirina deriyekê nû û destpêkeke erênî ye û wiha didomîne: "Tahliyekirina parlementeran dike ku rêyek nû ji bo hevdîtinan peyda bibe. Demokrasî jî wisa emir dike. Ez azadiya hevalên xwe, piştî referandomê wek hêviya destpêkirina proseyeke nû dibînim." Her wiha parlementerê CHPê Tanrikulu jî 'Tahliyekirina parlementeran wek vegera ji şaşiyê dinirxîne. Gerek hemû parlementerên girtî bên berdan, lê belê ji bo nirxandina ku dê proseyek nû dest pê bike hê zû ye.'

Serokê Berê yê Mazlumderê Ahmet Faruk Ünsal di bareyê vê mijarê de dibêje; " Têri nake lê baş e" . Bidawîanîna greva birçîbûnê û guherîna rewşa siyasî jî baş e. Bi awayekî me proseya referandomê derbas kir. Dê her kesek rûne û bifikire. Ez bawer im ku Hikûmet jî li gor xwe peyama xwe wergirtiye. Hê zû ye mirov bidawîanîna greva birçîbûnê û berdana parlementeran wek destpêka proseyeke nû binirxîne lê îşareteke wê ye.

"Dê gav bên avetin"

Parlamenterê HDPê yê Amedê İmam Taşçıer ragihand ku ew berdana her du parlementerên HDPê wek destpêkirina proseyeke nû dinirxînin û di wê hêviyê de ne. Piştî referandumê dê gavên demokratîk bên avêtin û pêşiya çareseriya mesela Kurdî vebe. Ev yek di nava daxwazên me de ye.

# Parlamenterê HDPê: Divê proseyeke nû dest pê bike



CESÎM ÎLHAN



**PARLAMENTERÊ** Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) ê Batmanê Mehmet Ali Aslan, radigihîne ku divê Kurd yekgirtina xwe ava bikin û eger ku Kurd yekgirtina xwe pêkneyînin destkeftên ku di sedsala 21. de bi dest xistine wê ji dest biçin. Parlamenterê HDP'ê herwiha diyar dike ku divê piştî ku referndûm jî bi encam bû, divê proseyeke nû dest pê bike û divê her kes rêzê ji biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê û encama wê jî bigire.

**Hûn rewşa Kurdan a salên dawîn li Rojhilata Navîn çawa dibînin?**

Salên dawîn yên sedsala 21. wê bibin salên Kurdan. Kurd wê bigihîjin mafên xwe yên xwezayî. Kurd erdnigarî jî di nav de wê mafê ziman û çanda xwe bi dest bixin. 40 milyon Kurd ji hev ne cihê û cuda ne. Dema ku sînor hatin rakirin wê bê dîtin ku heman erdnigarî ye. Ez di wê baweriyê de me ku di van 4-5 salên dawîn de sedsala 21. dê bibe sedsala Kurdan û wê destkeftên zêde bi dest bixin.

**Biryara pêkanîna referandûma serxwebûna Kurdistanê jî yek ji van destkeftiyan e?**

Deskeftiyeke mezin ji sedsala 21. jî ew e ku Kurd ber bi dewletbûnê ve diçin û dixwazin bibin dewlet. Li wê beşa Kurdistanê daxwazeke serxwebûnê heye û divê rêz ji vê yekê re bê girtin.

**Hûn gengeşî û aloziya di nava siyaseta Kurdî de çawa dinirxînin ?**

Dema ku li Şengalê di navbera PKK û Pêşmerge de pevçûn derket, min şîreta Bedîuzeman Seîdê Kurdî ya bo Kurdan parve kir. Seîdê Kurdî wiha dibêje; Gelî miletê Kurd! Di tifaqê de hêz, di yekitiyê de jiyan, di biratiyê de dilxweşî, di hikûmetê de silametî heye û pê de diçe; Xwendin, xwendin, xwendin... Destê hev girtin, destê hev girtin, destê hev girtin... Ji bo Kurdan a girîng ev e. Divê di navbera hemû Kurdan de her dem yekitî hebe. Min got 'Sedsala 21. sedsala Kurdan e'. Kurd dikarin bi hev re vê yekê pêk bînin. Eger yekitî pêk neyê em nikarin destkeftiyan bidest bixin û destkeftên heyî jî wê ji dest biçin. Berpirsyariya vê jî li ser milên wan kesên ku li ser navên Kurdan siyasetê dikin e. Nemaze jî divê pêşengên Kurdan vê yekê pêk bînin.

**Hûn pêwendiyên Tirkiyê yên bi Kurdan re çawa dinirxînin?**

Di serdema niha de cîranên Tirkiyê ne Îran, Îraq û Sûriye ne, Kurd in. Herwiha cîranên herî baş yên Tirkiyê jî Herêma Kurdistanê û Kurdên Rojava ne. Divê Tirkiyê nirxê vê yekê bizane. Sê aliyên Tirkiyê bi Kurdan girtî ne û ê hene. Tirkiyê beriya niha digot 'Em ji xeta sor venagerin'. Lêbelê niha li Rojhilata Navîn pêwendiyên Tirkiyê tenê bi Herêma Kurdisanê re hene.

**Em dikarin vê yekê bo Rojava jî bibêjin?**

Tirkiye niha bi çavekî dijminî û xwîndarî li Rojava dinêre, lêbelê dema ku hêzên navdewletî kantonên Rojava nas kirin, Tirkiye jî wê çaxê neçar e ku nas bike. Tirkiye ji bo ku xwe bigihîne Ereban, divê destûrê ji Kurdan bixwaze. Ji ber rewşa sînoran a niha li holê ye. Tirkiye bi riya axa Kurdistanê dikare xwe bigihîne Îraqê. Tirkiyê demekê Salih Mislim pêşwazî dikir. Lê niha weke dijmin dibîne. Wê dîsa wek berê lê bê. Dem wê Tirkiyê neçar bike. Dema ku Rojava, ber bi rêveberiyeke wek Herêma Kurdistanê ve çû, mecbûr e ku pêwendiyên baş ava bike.

**Niqaşa 'dengên Kurdan encama referandûmê diyar kir' heye. Bi rastî jî wisa ye gelo?**

Teqez bandora dengên Kurdan li ser referandûmê heye, lêbelê di referandûmê de hejmar girîng e û di vê hejmarê de tesîra Kurdan, Tirkan, Ereban û Elewiyan jî çêbûye.

**Niqaşa 'Kurdan Erdoğan kir serok' jî heye...**

Ez beşdarî vê nêrînê nabim.

**Çima?**

Ji ber ku piraniya Kurdan got 'Na'. Nemaze jî li Kurdistanê ev bi awayekî zelal derket holê. Bi rêjeya ji sedî 70ê bajar û navçeyên Kurdî got 'Na'. Ji vî alî ve tesîreke erênî li ser dengên 'Na' kir. Lewma Kurd ne di wê pozîsyonê de ne ku piştevaniya 'Erê' yê bikin. Herwiha dengên Kurdan hatin dizîn. Ji vî alî ve tesîrek li ser dengên Kurdan çêbûye.

**Proseya çareseriyê wê ji nû ve dest pê bike?**

Em ji bo gelan û pêşerojê her dem bi hêvî ne. Aştî û çareserî ji du rêgezên partiya me yên sereke ne. Lêbelê di du salên dawîn de hikûmetê prose bi awayekî yekalî bi dawî kir. Ahmet Türk tevî ku ji zîndanê derket jî qala aştiyê dike, lê berdevkê hikûmetê dibêje 'dema aştiyê derbas bû'. Ne mafê tu kesî ye ku aştiyê ji nav bibe. Ji ber ku aştî, silametî ji navên Xwedê ne. Tu kes nikare van ji bo siyaseta xwe bike amûr û dema ku xwast pêk bîne û dema ku xwast ji nav bibe.

**Eger aşitî nebe...**

Dema ku aşitî têk çû, xwîn dirije, fitne dest pê dike û însan dimirin. Xilaskirina aştiyê, êrîşeke li hemberî jiyana însanan. Him ji aliyê aborî û him ji aliyê çandî ve zirar û ziyan e ji bo hemû mirovatiyê. Ji ber vê divê aşitiyeke mayînde pêk were. Ez ji vê yekê bihêvî me: Tevî hemû zext û zordariyan jî di rastiyê de em bi ser ketin. Xwediyên 'Erê' yê jî dizanin ku li qadê têk çûn, lê li ser masê bi ser ketin. Ev dê wan ber bi avêtina gavên erênî ve dehf bide. Divê desthilat him ji bo silametiya xwe û him jî ji bo silametiya welat berê xwe bide aşitiyê.

**Çima ji bo silametiya xwe?**

Di rewşa niha de hilbijartineke pêşwext çêbibe, AKP vedigere encamên 7ê Hezîranê. Dengên hatine dayîn li holê ne. AKP, MHP, HUDA PAR û BBPê tifaqek ava kirin. Ev tifaq jî li gorî encamên 7ê Hezîranê dike ji sedî 67ê dengan. Lêbelê niha ev rêje daket ji sedî 50yan. Dema ku me ev li MHP, HUDA PAR û BBPê parve kir, AKP dadikeve sedî 40an û MHP jî dimîne di bin bendavê de. Yên din jixwe di bin bendavê de ne. Ya herî girîng jî ew e ku Erdoğan jî û hikûmet jî dizanin ku têk çûne. Divê van encaman baş bixwînin. Eger li ser polîtîkaya xwe ya her du salên dawîn dewam bikin, hikûmet jî û serokatî jî wê ji dest biçin.

**Ji bo destpêkirina proseya çareseriyê divê hikûmet kîjan gavan bavêje?**

Mafê parlamenterî û şaredariyan ku me bi destxistî hene. Lêbelê parlamenter û şaredarên me niha girtî ne. Ev tişt bi awayekî bê hiqûqî pêk hatiye. Bi serbestberdana van divê madî û manewî tezmînata wan jî bê dayîn.

**Gelo wê vê yekê bikin?**

Ji ber ku gotin û kiryarên wan hev du nagirin, em nikarin baweriya xwe pê bînin. Eger bi rastî jî li pişt proseya çareseriyê bisekinin em ê piştgiriyê bidin. Proseya çareseriyê wê teqez dest pê bike. Em bihêvî ne! Ev hikûmeta li ser kar nede destpêkirin jî, divê ev şer bidawî bibe. Hikûmeteke din wê were û wê bidawî bike. Li Kolombiyayê şer 50 salan berdewam kir û li gor hin çavkaniyan di vî şerî de 250 hezar însan mirin. Bi dehan hikûmet hatin ser kar lê ew kêşe çareser nekirin, di dawiyê de hikûmetek hat ser kar, çareseriyek peyda kir û aştî pêk anî. Li vê derê jî dê wisa be. Ji bo gavên ku divê niha werin avêtin, em piştî 10 salên din bavêjin. Ev yek hem jiyana însanan dixe bin metirsiyê, hem civakê ji hev dûr dixe û hem jî aboriyê têk dibe. Ango her ku rojek derbas bibe fitne belav dibe. Ji bo çi bira, birayê xwe bikûje? Eger ji bo destpêkirina proseyeke nû gav bên avêtin ev dê bo hemû civakê baş be. Ji bo aştiyê divê herkes berjewendiyên xwe deynin aliyekî.

**Proseyeke nû dest pê bike, divê çi gav bên avêtin?**

Ji bo aşitiyeke mayînde divê Kurd ji derbasiyên xwe hin dersan wergirin û gavên xwe li gor wê bi zexim bavêjin. Di dema proseya aşitiyê ya yekem de neyîna bingeheke yasayî kêmasî bû. Divê Meclîs di proseya çareseriyê de midaxil be. Her wiha divê saziyên bi îtîbar yên navnetewî jî divê têkildarî proseyê bibin. Ev xulekên pir ciddî ne. Dema bingeha yasayî û çavdêrên navnetewî tune bin her kes hevûdu sûcdar dike. Ger rêyeke bi tevlîbûna hemû aliyan were hilbijartin. Divê proseyek wisa were dest pê kirin ku Saziyên sivîl, Akademîsyen û kesên zanyar di vê proseyê de cîh bigirin. Ji bo pirsgirêka Kurd û Kurdistanê çareser bibe gerek rê û rêbazên zelal bên hilbijartin. Ev mesele ne tenê bi Tirkiyeyê re têkildar e. Pirsgirêka herî mezin a Rojhilata Navîn e. Di vê mijarê de ger civak bi awayekî samîmî û vekirî bê haydar kirin. Divê çavdêrên derveyî mijarê hebin. Wisa bawer im dê civak jî qanih bibe. Ew kesên li hember aşitiyê disekinin jî bi vî awayî dê qanih bibin. Di vê mijarê de berpirsyar hikûmet e. Hemû derfet di destê wan de ye. Bila aşitî vejîn bide, çareserî dest pê bike. Binêrin hemû îktîdar demkî ne. Îro hene sibê tune ne. Divê siyaset bibe bingeha hizûr û bextewariya civakê.

**Berpirsyar tenê Dewlet e, Qet sûncê Siyaseta Kurdî jî nîne?**

Bêguman divê hemû aktorên pêvajoya çareseriyê ya ku di sala 2013'an de dest pê kir xwe rexne bikin. Ev ji bo her du aliyan jî wisa ye. Kêmasiyên her du aliyan jî hene û divê ev nebin astengî li pêşiya proseyeke nû. Vê carê divê em ji derbasiya xwe ders wergirin û ji bo pêşeroja xwe gavên sexlem û zelal bavêjin. Jixwe HDP çend cara vê rexneyê li xwe girtiye û kêmasiyên xwe anine zimên. Xwezî Hikûmetê jî xwe rexne

**Erdoğan, dibêje "Çeka deynin werin em biaxivin" ?**

Dema Erdoğan banga çek danînê bike divê ji saziyên têkildar yên Dewletê re jî vê bangê bike. Ev karên wisa girîng bi dirûşmeyên li qadên mitîngên hilbijartinê nayên çareserkirin. Bi sedan sazî hene ku bi van mijaran re têkildar in. Ger Erdoğan, samimî û dirûst be bila bangî saziyên xwe bike û daxwaza çareseriyê ji wan bike. Ev daxwaz gerek tenê ne di demên hilbijartinan de werin zimên.

**Pêşiya Referandomê de mijara Eyaleta hat rojevê. Gelo ev mimkin e?**

Hikûmet, tehamûla şaredarê navçeyekê ku ji aliyê gel ve hatiye hilbijartin nake. Niha dê Federasyonê bide Kurdan? Bawer nakim ev hikûmet gavên wisa bavêje. Mimkûn nabînim di vê demê de. Bi min, xwestin ku dilê Kurdan li dengên "Erê" geş bikin. Qet ne bawer im ku ev hikûmet gaveke wisa girîng bavêje.

**Ew gotinên "HDP, ji xwînê feyz digire"?**

HDP, siyaseta xwe li ser xwînê ava nake. Hilbijartinên 7ê Hezîranê di dema proseya aşitiyê de hatin kirin. Di wê hilbijartinê de HDP, ji aliyê gel ve piştgiriyeke xurt dît. Yanî aştî li me hat û gel xwe sparte me. Di vê çarçovê de HDP, çima proseyê bidawî bîne? Rêya herî bi silamet aştî ye. Min di axaftinên xwe yên meclîsê de jî ev anî zîmên. Min wan vexwand ser rêya Qur'anê û Sinneta Pêxember. Bes em vê pirsgirêkê çareser bikin. Vegera ji xeletiyan çiqas demildest be ew çend bi qedr e. Bes êdî em li berpirsyaran geriyan, bila êdî proseya aştiyê dest pê bike û çareseriyek peyda bibe. Divê em di rêya şer de israr nekin.

Têkiliyên HDPê bi Ewrûpa, DYA û Saziyên Navnetewî re çawa ne?

Beriya du salan jî mirov dikaribû bigota di asta herî kêm de bûn. Lê ji dema kû şer dest pê kir û mafên mirovan hatin bin pê kirin û vir de têkiliyên dîplomatîk û xurt rû dan. A rast gerek ji serî de jî wisa bûya. Li gor demên berê niha têkiliyên HDPê bi giştî DYA û bi hemû dewletên Ewrûpayê re çêtir in. Her wiha divê HDP bi dewletên Rojhilata Navîn re jî têkiliyên xwe baş bike.

> Divê proseyek wisa were dest pê kirin ku Saziyên sivîl, Akademîsyen û kesên zanyar di vê proseyê de cîh bigrin. Ji bo pirsgirêka Kurd û Kurdistanê çareser bibe divê rê û rêbazên zelal bên hilbijartin. Kêmasiyên ku hatine kirin divê ji holê werin rakirin û bi awayekî sexlem gav bên avêtin.





## MEHMET ALÎ ASLAN KÎ YE?

Di sala 1975'an de li Farqîna Diyarbekir ji dayik bûye. Dibistana seretayî li Farqîn û Hezro xwendiye. Di sala 1998'an de li zaningeha Anatoliya Navîn beşa Karsazî qedand. Di sala 2002yan de Faqûlteya Sêrtê beşa Mamostetiyê bidawî anî û dîploma xwe wergirt. Di heman salê de dest bi mamostetiyê kir û di 7ê Hezîranê û 1ê Mijdara 2015an de ji Batmanê wek Parlementerê HDPê hat hilbijartin. Niha jî Parlementerê HDPê yê Batmanê ye.



MURAD CÎWAN

## Zankoyên li Bakurê Kurdistanê

Yek ji wan reformên berbiçav ên Tirkiyeyê, damezirandinên zankoyan (unîversîteyan) ên li her bajarî yên van salên dawiyê ye. Li hemû bajaran zankoyên dewletê û li gelek bajaran jî li gel wan yên taybetî, yên weqfan û civakên sivîl ava bûne.

Gelek siyasetmedar, entelektuel û pispor bi sedemên cuda, avakarina zankoyan li her bajarî û zêdetir jî li derveyê metropolan rexne dikin. Helbet zanko warên zanistê ne, roleka wan a mezin di perwerde, ilim, kultur, siyaset û çareserkirina pirsgirêkên civakê de hene. Lazim e piralî li meseleyan bê nihêrîn, bi hezaran pirs û pirsgirêk hene ku di dema damezirandinê de divê li ber çavan bên girtin. Helbet di çarçeveya vê nivîsê de hemû nikarin bên destnîşankirin. Ya rastî ez ne pisporê vê meselê me û lêkolînên min ên zanistî jî di vî warî de tunene. Bes çend xalên ji alî min ve balkêş hene ku di encama muşahedeyên wan de ez dixwazim hin tiştan destnîşan bikim.

Ji alî prensîbên azadî û demokrasiyê, gihandina zanînê, huner û îrfanê ya ber lingên her welatiyekî, derxistina zanistan ji bin monopola metropolan û elîtên wan, belavkirina dezgeyên zankoyan û şaxên wan bi berfirehî li seranserê welêt gelek baş e, demokrasiye berfirehtir dike, derfetên mezin vedike. Ji alî serûbin nebûna demografiya civakê û rawestandina pêlên koçberiyê a ne bi darê zorê û ne bi şiddetê jî giring e.

Eşkere ye ku ev dezgehên nuhdamezirandî, ji alî avayî-teknolojî û îmkanên xwe yên aborî û kadroyên perwerdekirinê, kalîteya pêşkêşkirina zanistan, kultur û huneran ve, xwedan kêmasiyên mezin in. Bi taybetî yên bajarên Kurdistanê, di nav mehrûmiyetê de digevizin. Pirsgirêk û kêmasîyên wiha, ne bi lêkolînên mezin, bi saya muşahedeyên nêzîk jî tên dîtin.

Kontrol û serdestiya dewlet-desthilatê a li ser zankoyan bi giştî, perwerdeya şovenîst a doktrîner, a nedemokratîk , tunebûna kadroyên gihaştî yên fêrker, bêîmkaniyên xwendevan û şagirtan, li van zankoyên nuhavabûyî zêdetir tên hiskirin. Ev hemû pirsgirêk in, bi hezaran yên din jî hene.

Tevî vê jî ez dibînim ku ev zanko li derên avabûyî, bi dereceya xwe entegrekirina bi civata kurd a dora xwe û biliyana bi pirsgirêkên wê civakê re, roleka ronahîder di nasandina civakê û pêşdeanîna meziyet, bikêrhatin, nirx û hêjayiyên wê û destnîşankirina pirsgirêk, êş û kêmasiyan û riyên çareseriyên wan de rolên giring ên pozîtîf dilîzin.

Bi taybetî meriv dibîne ku beşên civakî; yên tarîxê, ilmên însanî, kultur û zimanevanî, jiyana dînî, felsefî û tesewifî hem bi programên xwe yên perwerdeya salane, hem jî bi civîn û konferansên xwe yên zanistî yên neteweyî û navneteweyî karên balkêş ên hêja dikin.

Xebatên Zankoyên Artuqluyê, Dicleyê, Hekkariyê, Bîngolê, Wanê, Mûşê û Ruhayê, bi taybetî beşên kurdî yên heyî, hêjayî binavkirinê ne. Bi kêmasî, ew rê nîşan didin ku bi peydabûna azadiya zanistî, derfetên maddî û îdarî, bilindbûna asta perwerdeyê dikare çi karên hêja, li ser jiyana maddî û manewî ya civaka Kurdistanê bi hemû pêkhateyên xwe ve bên kirin. Min gelek name û tezên li ser tarîxê, civakên eşîrî, dînî, mezhebî, etnîkî û zimanî dîtine ku dilxweşkir in û hêviyan dibexşin. Ji ya Hekkariyê min çend meqale û name bidestxistin ku yên encama programên salane û konferansa ne; li ser dewrên cuda yên mîrekiya Hekkariyê û derûdora wê, têra xwe agahîbexş in. Ji Dicleyê, Artuqluyê, Urfayê, Wanê, Bîngolê û Mûşê berhemên derbarê perwerdeya li ser medreseyên Kurdistanê, jiyana tesewufî, li ser seyda, mele û şêxên di dereceya mudderisiyê de, li ser mizgeft, medrese, tekye û weqfan gelek zanîn derketine. Agahiyên li ser mela û seydayên Kurdistanê yên ku ez wan nas dikim, min navên wan û karên wan ên qenc bihîstine wê qenaetê bi meriv re çêdikin ku ne bi saya van zankoyên Kurdistanê bûna ew ê miheqeq di nav toz û dûmana mêjuyê de wenda bibûna. Li Bîngolê, Dersimê û Artuqluyê li ser ziman, edebiyat û kultura kurdî bi giştî, kirdkî (zazakî) bi taybetî, xebatên hêja ji bal şagirt û mamosteyan tên kirin.

Ya bala min kêşa beşên îlahiyatê ên van zankoyan di biserxistina van kar û berên hêja de gelek aktîf in. Min bi xwe ew li pêşiya hemû beşan dîtin, muhtemelen ji ber zanîna erebiye û tarîxa dînê Îslamê, heta belkî dîndarî dibe rêgir li ber Îdeolojiya resmî nasyonalîzmê.. Pişt re beşên zimanê kurdî tê. Tarîx hê jî bi giranî di bin siya tezên tarîxê yên tirkçîtiyê de ne, îdeolojiya dewletê zora wan dibe.

Hêvî ew e, ne bi nivîsên wek a min a encama muşahedeyan, lê bi rapor û konferansên encama xebatên zanistî rewşa zankoyên bajarên bakur, bi bikêrhatin û kêmasîyan bê ronahîkirin, ji bo pêşdexistina wan derfet bên zêdekirin.

Piştî referandûma 16ê Nîsanê;

# Ji bo kêşeya Kurdî dê gavên nû bên avêtin?






NÛJÎN ONEN

**DESTÛRA** 1982'an ev cara 22'an e ku tê guhertin û herî dawî jî 18 madeyên wê hatin guhertin. Lêbelê di vê gûhertina dawî de cûdahiyeke mezin hebû ku bi xwe re guhertina pergala rêveberiya Tirkiyê jî tîne û di 16 Nîsanê de li Tirkiyeyê referandûmek pêk hat. Di encama referandûmê de %51.4 dengên 'erê' derket û pergala parlamenteriyê rabû li şûna wê 'Pergala Hikûmeta Serokkomariyê' ku weke 'pergala serokatiyê' tê zanîn hat qebûlkirin. Pergala nû dê piştî hilbijartinên 2019'an bicî bibe. Referandûm bi dawî bû lêbelê gengeşî û niqaşên li ser encaman bi dawî nebûne. Herwiha li ser encamên referandûmê yên bajarên Kurdan jî gelek niqaş hatin kirin. Ji ber ku li gorî encaman rêjeya dengên 'erê' her çiqas li gorî dengên 'na' kêm be jî têrî wê yekê kir ku bala raya giştî ya Tirkiyê bikişîne. Serokkomar Recep Tayyip Erdoğan jî di axaftina xwe ya ewil a piştî diyarbûna encaman sipasiya hilbijêrên Kurd kir. Herwiha hat gotin ku Kurdan ji MHPê zêdetir dengên 'erê'da ne û wê ev helwesta Kurdan li ber çavan were girtin.

Van geşedanan jî bi xwe re ev pirs anîn; Gelo pêkan e ku proseya çareseriyê ji nû ve dest pê bike? Polîtîkaya hikûmetê ya li hemberî Kurdan wê bigûhere? Encamên referandûmê wê çi bandorê li Kurdan bikin? Partiyên Kurdî jî li ser encamên referandûmê, gengeşiyên dawîn û van pirsan ji Heftenameya Basê re axivîn.








**Arif Sevinç:**

Bi binpêkirina mafên Kurdan yên rewa, rêyeke ku bigihêjinê tune ye. Di referandûmê de bi dengên Kurdan encam diyar bû, ev rast e. Tirkiye welatekî wiha ye ku eger piştgiriya Kurdan di cîhekî an projeyekê de tunebe ew proje birêve naçe û hikumetek bi îstikrar ava nabe û tu kêşeyên Tirkiye jî çareser nabin.

**Hişyar Özalp:**

Divê welatiyên Kurdistanî di navbera Kemalîst û Îslamîstan de hilbijartinek nekiribin. Ji ber ku herdu aliyan jî mafê me yê dewletbûnê binpêkirine. Divê em ji bo çareseriya xwe, piştevaniya cîhana nûjen bistînin û serxwebûna xwe bi wî awayî pêk bînin.

**Doğan: Çareseriyeke yekalî nayê qebûlkirin**

Berdevkê Tevgera Azadî Sedat Doğan li ser pirsa, di bareya egera destpêkirina proseyeke çareseriyê ya nû de dibêje: "Eger hişmendiya Tirkan ku hebûna Kurdan qebûl dike hebûya dê di destûrê de behsa vê yekê bihata kirin. Bingeha pirsa Kurd bi naskirina nasnameya Kurdan ve têkildar e. Di vê destûrê de derbarê Kurdan de tiştek tune ye. Bi tunehesibandina daxwaza zimanê dayikê hûn nikarin behsa çareseriya pirsa Kurdan bikin. Çareseriya yekalî dê zîndan, qayyim û rejîma tirsê be. Eger PKK çareseriyek yekalî liser Kurdan ferz bike,civaka Kurd vê çareseriyê jî qebul nake."

**Bozyel: Rola Kurdan dê bihêztir bibe**

Berdevkê Partiya Sosyalîsta Kurdistanê (PSK) Bayram Bozyel dibêje bi ragihandina rewşa awarte qada siyaseta demokratîk ji bo Kurdan teng bû. Bozyel balê dikşîne ser daxwaza guherîna destûra bingehîn û diyar dike ev daxwaz bi tifaqa MHP û AKPê hatiye meclîsê û wiha berdewam dike: "AKP ji ber ku bi MHPê re hevkarî kir xwe ji pirsa Kurd dûr xist. Di rewşeke wiha de gelo pêvajoyeke nû dikare dest pê bike? Ez nikarim bi rehetî ji vê pirsê re bibêjim erê . Heta hilbijartina Serokkomariyê ya 2019'an, tifaqa MHP û AKP dê berdewam bike û divê Kurd di warê çareseriya pirsa Kurd de li benda gavekê nemînin."

Bozyel di dewama axiftina xwe de dide zanîn ku operasyona Tirkiyê ya li dijî Rojava bi tiştên ku PYDê bi destxistine pêwendîdar e. Diyar e polîtîkayên hikûmetê yên Rojava û Sûriye bi giştî li dijî Kurd û PYDê ne. Heta ku polîtîkayên Tirkiye yên li dijî Rojava negûherin ne pêkan e ku proseyeke nû dest pê bike. Di referandûmê de pesendbûna pergala Serokkomariyê li gel hemû tiştên xwe yê neyênî jî ji bo pêvajoya siyasî ya Kurdan dê rola wan bihêztir bike. Ji ber ku Serokkomarê ku dê hikûmetê damezirîne divê ji sedî 50 dengan bistîne. Di rewşek wiha de dê tifaqên nû jî bi xwe re bîne. Ev jî dikare Serokkomarê ku dê bê hilbijartin bi Kurdan re tifaqên nû bîne rojevê. Kurd di pergala nû de ji bo ku hebûna xwe diyar bike divê helwest û sekneke netewî nîşan bidin.

**Kardaş: Pergala Serokatiyê bo Kurdan a herî baş e**

Serokê Partiya Demokrat a Kurdistana Tirkiye(PDK-T) Mehmet Emin Kardaş balê dikşîne ser rêjaya dengên 'erê' yên li bajarên Kurdan û wiha pê de diçe: "Ji bo Kurdan pergala herî baş 'Pergala Serokatiyê' ye ji ber wê yekê me alîgirên partiya xwe serbest hiştin. Di pêşerojê de em bi hêvî ne ku proseya çareseriyê dest pê bike û divê di proseya nû de hemu alî û rêxistinên Kurdan cih bigrin. Mafê Kurdan yê netewî heye ev jî ji xeynî pevçûnên di navbera PKK-HDP û dewletê dê bibe sedem ku doza Kurdan ya netewî derkeve holê."

**Sevinç: Projeyên ku piştgiriya Kurdan nestîne nagihêje ti encamê '**

Cîgirê Serokê Partiya Maf û Azadiyan(Hak-Par) Arif Sevinç jî diyar dike ku bêyî piştgiriya Kurdan tu proje naçin serî û gotinên xwe wiha berdewam dike: "Pirsa Kurd pirsa Tirkiye ya bingehîn e û paşerojeke wê ya 200 salî heye. Heta ku ev pirsa Kurd çareser nebe Tirkiye nikare demokratîk bibe û pêş bikeve. Pirsa Kurd pirseke netewî ye û nabe ku daxînin asta PKKê. Bi şer, operasyon û binpêkirina mafê Kurdan yê rewa nikarin bigihêjin encamekê. Tirkiye welatekî wiha ye ku eger piştgiriya Kurdan di cihekî an projeyekê de tunebe ew proje birêve naçe û hikumetek bi îstikrar ava nabe û ti kêşeyên Tirkiye jî çareser nabin."

**Özalp: Çareserî, bikaranîna mafê self-determinasyon e**

Cîgirê Sekreterê Partiya Demokrat a Kurdistana Bakur (PDK-Bakur) Hişyar Özalp jî dibêje: "Vegera Kurdan ya proseya çareseriyê ti sûda wê bo wan tune ye. Di madeyên mitabaqata Dolmabahçe de ji bo Kurd û Kurdistanê çareseriya mafê kolektîf û takekesî yê bingehîn tûne bû. Diviyabû welatiyên Kurdistanî di navbera Kemalîst û Îslamîstan hilbijartinek nekira. Ji ber ku her du aliyan jî mafê me yê dewletbûnê binpê kirin. Divê em ji bo çareseriya xwe piştevaniya cîhana nûjen bistînin û serxwebûna xwe bi wî awayî pêk bînin."

**Özçelik: Divê helwesteke Kurdistanî bê nîşandan**

Serokê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) Mustafa Özçelik di bareya encamên referandûmê de wiha dibêje: "Encamên referandûmê peyamên bi vî awayî dide, divê êdî ev şer bi dawî bibe çareseriyeke siyasî pêk were û diyalog derkeve pêş. Em ê piştgiriya hemû gavên bo dawîlêanîna şer, bikin. Eger dîsa ev mesele di navbera PKKê û dewletê de be û ji bo çareserkirina pirsa Kurd bernameyek dernekeve holê ev dê ne çareserî be dê bibe paşxistina çareseriya pirsa Kurd. Divê Kurd di pergala desthilatdariya Tirkan de nebe piştevanê tu aliyan û helwesteke Kurdistanî û serxwebûnxwaz nîşan bidin."




# Encama referandumê û Kurd



**MESUT TEK**

**RAPIRSIYA** guhartina destura Tirkiyê hate çêkirin. Lêbelê axaftin û nîqaş li ser referandum û encama wê, ku beriya 16ê Avrilê destpêkirîbûn, her berdewam e û ev yêka hanê jî tiştekî siruştî ye.

Partiyên siyasî, pîspor, dezgeyên lêkolinê û zankoyan encama rapirsiyê ji hemû aliyên ve dane ber bahs û lêkolinê û usa xuya ye ku karên hanê wê berdewam bin û gelek zanyarî li ser rapirsiyê bêne aşkerekirin. Bê guman kar û zanyariyên hanê girîng in û ji bona destnişankirina siyaset û daxwazan dibin alîkar.

Ez naxwazim bi hûrgilî behsa rapirsî û encama wê bikim, lêbelê hinek xalên bingehîn hene ku ji bona têgihiştina rastiyan pêwist e werin destnişan kirin:

-Divê Kurd ne li dijî sîstema serokatiyê bin û ne jî sîstema parlamenteriyê. Divê ji bîra me neçe ku tê da zilm û zordarî û qetlîemên ku li ser gelê me hatine kirin, di sîstema parlamenteriyê da hatine encam danê û sîstema serokatiyê ku AP Partî bi alikariya MHP pêşkeş kiriye, sîstema takekesî ye û rê li ber otorîterîzmê vedike.

> Mirov dikare gelek tiştan li ser pêvajoya referandum û encama wê bibêje. Lê belê li gor bîr û baweriya min pêvajoya piştî rapirsî giringtir e û divê Kurdistanî li ser vê babatê bifikirin.

-Destûra Tirkiyê destûreka monolîst e li ser înkarkirina deng û rengên vî welatî ku Tirk û Musulman nînin, hatiye damezrandin û her tim bûye sedemek ji sedemên aloziyên siyasî û civakî.

-Çîroka gûhartina Destûra Tirkiyê dirêj e, lê belê hemû gûhartinên ku heya îro hatine kirin, ne li ser kakila Desturê bûne. Naveroka wê ya monopolîst her maye û pêşniyara dawî jî ku gel dengê xwe dane, bi vî awayî ye û naveroka wê ya yekparêzî her li ciyê xwe ye.

-Gelê Kurd û dezgeyên sîvîl di amadekirina projeya gûhartina Desturê de, ku ya AK Partî û MHP bû, beşdar nebûne.

-Rapirsî di bin zirufa Rewşa Awarte da hatiye encam dan. Bi dehan hezar karmend, mamoste û akademîsyen ji kar hatibûn derxistin. Bêtirî deh hezar kes hatibûn zindanî kirin, ku di nava wan da serok û rêvebir û endamên partî û endamên Meclisê jî hene. Gelek rojname, kovar û kanalên televîzyonê û dezgeyên sîvîl hatibûn qedexe kirin.

-Destûr peymana lihevhatin û pêkvejiyana pêkhateyên civakê ye. Lê belê encama rapirsiyê careke din nîşan daye ku pêkhateyên Tirkiyê roj bi roj nakok dibin û ji hev dûr dikevin.

-Lêkolînên li ser encama rapirsî nişan didin ku yên dengê "erê" dane, hemû alîgîren AKP û MHP nînin, tê de endamên partiyên din jî hene. Rewşa bereyê "na jî" bî vî awayî ye, rengav reng in.

-Rast e, yan na, lê belê gelek gazinc, şîk û gûman li ser encama rapirsê hene.

-Pêvajoya rapirsê, encama wê û niqaşên ku paş rapirsiyê têne kirin, nîşan didin ku pirsa Destûr pirseke bingehîn a Tirkiyê ye û siberojê de dibe yek ji xalên serekî di rojeva siyasiya Tirkiyê de.

-Dengê Kurdan ne yek reng bû. Hinek Kurd dengê "erê", hinekan "na" gotin û hinekan jî protesto kirin û neçûn ser sindoqan. Lê encama rapirsê nişan daye ku Kurd faktoreke bi bandor û girîng in, di proseya gûhartin û demokratizekirina Tirkiyê de. Dikarin bi giraniya xwe parsengê hêzan bigûherin.

-Li Kurdistana Bakur dengên "erê", ku bi wateya piştgiriya Erdoxan e, ji dengên AK Partiyê yên berê zêdetir e. Meriv dikare beje Kurd bi dengên "erê" Erdoxan û partiya wî rizgar kirin.

-Kurdên ku dengê "erê" dane, hemû ne endam û alîgîrên AK Partî ne û piştgiriya siyaseta vê partiyê derheqê Kurdistana Bakurê jî nakin. Berovajî, dijî hinek kiryarên AK Partiyê ne ku li Surê, Cîzre û Silopî û Gewer û Şirnexê encam daye. Lê belê dibînin û dibêjin ku "ji AK Partiyê reformxwaztir hêz nîn e û îro di nava siyasetmedarên Tirkan da tenê Erdoxan dikare pirsa Kurd çareser bike."


-Serketina dengê "erê" bi rêjaya kêm, hem baş bûye him jî karê AK partiyê dijwartir kiriye. Baş bûye, ji ber ku ger rêje pirtir bûya, egera vê hebû ku deshilatdariya Erdoxan ber bi diktatoriyê ve biçe. Lê Erdoxan îro gava bixwaze pêngavek bavêje divê li ber çav bigire ku li Tirkiyê, ji du kasan kesek ne ligel wî ye.

-Karê hikumeta AK Partî dijwartir kiriye, ji ber ku encama rapirsî nişan daye ku AK partî nikare wekî berê hespê xwe gor dilê xwe bibezîne û mecbur e guhê xwe bide daxwaza gel û taybetî jî daxwaza gelê Kurd.

-Dijwar bûye ji ber ku AK Partî nikare hem hevpeymaniya xwe ligel MHP bidomîne, hem jî xwesteka Kurdan cî be cî bike ku bi dengê "erê" hişyarî dane Erdoxan û partiya wî.

Meriv dikare gelek tişt li ser pêvajoya referandum û encama wê bibêje. Lê belê li gor bîr û baweriya min pêvajoya piştî rapirsî giringtir e û divê Kurdistanî li ser vê babatê bifikirin.

Îro xuya ye ku amadekirina destûreke nû, hevdem û demokrat yek ji xalên sereke ya rojeva siyasî ya Tirkiyê ye. Daxwaza destûreke nû û giftugo li ser vê babetê dest pê kiriye û dîyar e ku demeke dirêj wê berdewam be.



Vê carê em Kurdistanî divê li hev bikin û bo birûrayê ragihînin ku destûreke çawa dixwazin. Divê vê carê helwesta Kurdistaniyan li ser destûra nû yek be, da ku bikarin bigîhijin daxwazên xwe yên destûrî.

Bê guman Erdoxan û AK Partî piştî rapirsiyê divê li ser pirsa Kurd tiştên nû bêjin û kar û xebatan bikin. Egerna, guhê xwe nedin daxwaza gelê Kurd û giraniya wê li ber çavan negirin, nikarin pirsên siyasî û civakî yên Tirkiyê çareser bikin û wê di nava kêşeyan da bifetisin.

Ligel vê, bûyerên ku li Rojhilata Navîn, li Kurdistana Başur û Rojhilat û Rojava diqewimin, wê carenûsa gelê me destnişan bikin.

Di rewşa Rojhilata Navîn û seranserê Kurdistanê ya îroyîn de, gelê me rû be ruyê derfetên zêrîn e. Ji bona ku ji vê derfetê îstîfade bikin û xebata azadiya Kurdistanê bigihinin armanca xwe, divê hêzên Kurdistanî ji bona parastina berjewendiyên giştî yekdeng û yekhelwest bin û bi hev re kar û xebatê bikin.

Çend gotinên din;

Piştî rapirsiyê, bereyê "na" daxwaz ji gelê me jî kirine ku derkevin kolanan û encama referandumê protesto bikin.

Bi gor bîr û baweriya min jî divê Kurd derkeve kuçe û kolanan. Lê ne ji bona ku bibe beşek ji nakokî û şer û pevçunên "erê" û "na", ji bona demokrasî û azadiya Kurdistanê, ji bona bi destxistina mafên demokratîk û netewî û parastina nirxên niştimanî...

Divê em Kurd guhê xwe nedin daxwaza Kemalîstan û hinek rêxistinên din ku hevpeymana Kemalîstan in.

---



**HOŞENG OSÊ**

## Bijî "serok" Cuma!

> Dêmek gef û tehdîdên Bayık ku li ser zimanê Karayılan hatin gotin, ne tenê ji dewleta Tirk re bû lê ji A. Ocalan û M. Barzanî jî re bûn. Bayık xwest ji her dûyan re bêje: vaye zilamê we ku hûn hêviya xwe bi wî girê didin, gefan li we dixwe û we tehdîd dike.

Di sala 2000'î de welatparêzekî Apoçî, weke henek, ji min re got: "şert û mercên sereke ji bo hilbijartina kesê ku bibe serokê PKK, (eger xwedê neke, serok Apo tiştek pê bê), gerek navê wî li gorî vê durişimê be; bijî serok Apo. Gerek navê wî kesî valahiya navê Apo dagire". Ev welatparêz navên serkirdeyên PKK li vê durişimê siwar kir û pîvand ka kîjan nav ritma wî xweş e û li durişimê tê: "Bijî serok Cuma (C. Bayık)... na ne xweş e. Bijî serok Cemal (M. karayılan)?... na ew jî ne xweş e. Bijî serok Ebas (D. Kalkan)?.. na ne xweş e. Bijî serok Ferhad (birayê A. Ocalan)?. ew jî ne xweş e. Bijî serok Qarasu?... na na, qet ne xweş e. Hema bi xwedê, ji "bijî serok Apo" xweştir nîne. Ev 30 sal in em wisa hînbûne û gelek zor û dijwar e em vê durişimê bigûherin".

Mebesta min ji vê bîranînê ew e ku em piçek behsa rewşa PKKê bikin û hewl bidin bersiva vê pirsê bidin: Gelo hîna PKKê di bin kontrola Ocalan de ye yan na?!.

Mesaja PKKê-KCKê di newrozê de bi rêya vîdioya M. Karayılan ve hate dan. Li bin baranê û pêşberî şervanên nû, Karayılan rexneyên tund li AKPê û PDKê kir û gefan li Turkiyê û kesên dixwazin têkevin navbera PKKê û dewletê, xwar. Ew gef ne yên Karayılan bûn, lê belê yên C. Bayık bûn û bi zanebûn Karayılan hat hilbijartin da ku gef (tehdîd) li ser zimanê wî be, ji ber gelek sedeman:

1- Karayılan xwediyê hunera xîtab û peyvînê ye û ji hemû serkirdeyên PKKê bêtir xweş û bi zelalî bi Kurdî diaxive û tersî Bayık, Kalkan, Karasu û Kaytan e ku bi Tirkî diaxivin û şêwe zar û axaftina wan sist e û "vinvinokî" ye, a Karayılan tekûz bi coş e.

2- Karayılan zilamê Ocalan yê herî dawî ku di serkirdetiya PKKê de maye û hest û nerînên wî ji çepgiriya zingarî bêtir neteweperwerî ne. Lewma Karayılan bi wî çavên dijminatîyê li PDKê û serkirdayetiya Kurdistana Îraqê nanêre û dikare digel PDKê û M. Barzanî bigihêje rekeftinekê.

Dêmek gef û tehdîdên Bayık ku li ser zimanê Karayılan hatin gotin, ne tenê ji dewleta Tirk re bû lê ji A. Ocalan û M. Barzanî jî re bûn. Bayık xwest ji her dûyan re bêje: vaye zilamê we ku hûn hêviya xwe bi wî girê didin, gefan li we dixwe û we tehdîd dike. Hûn (Ocalan+Barzanî) nikarin bêyî min bi dewleta Tirk re tu peyaman û rêkeftinan mor bikin.

Mirov li daxûyaniyên Ocalan yên berî 5-6 salan vegere, dê bibîne ku wî tu carî nexwestiye were serbest berdan, lê tenê xwestiye rewşa wî ya zindanê xweş û baş bibe da ku karibe bi "peywira" xwe rabe. Ev "peywir" û "erk û delamet" ew e ku Ocalan, çarseriyê û çekberdanê bi PKKê bide qebûl kirin. Di piraniya daxuyaniyên xwe de, Ocalan tim dewleta Tirk û AKPê hişiyar kiriye ku eger çareseriyê qebûl nekin, metirsî heye ku PKKê ji bin kontrola Ocalan derkeve. Lê dewlet û Erdogan û AKPê guh nedan bang û hişiyariyên Ocalan.

Jixwe HDPê pêşniyaza Ocalan bû ku partiyeke hevbeş saz bibe û nûnertiya daxwaz û aramancên hemû pêkhatiyên Tirkiyê bike, lewma BDPe bû HDPe. Di dîroka Kurdên Tirkiyê de ji 1921ê û 2015'an de cara yekemîn bû ku partiyeke (Kurd) karibû 80ê parlemanter bişîne parlemantoye. Ev serketin ancama pêşniyaz û perspektîvên Ocalan bû, û encama danûstendinên di navbera Ocalan û Erdogan bûn. Ev deskeftên dîrokî dê rê li ber çareseriyên dîrokî jî vekirina. Lê çi çê bû?. Bayık û serkirdetiya PKKê ku ji salên 2003ê ta 2013an digotin "moxateb Ocalan e, ne em in", hêdî hêdî dest bi marijinalkirina Ocalan kirin. Guman hene ku êdî Ocalan jî "Qandîl" boykot kiriye. Ango nakokî di navbera Ocalan û Bayık de heye, lê nayê eşkere kirin, her ku diçe kûrtir dibe. Ew şandeya ku di navbera Îmaralı û Qandîlê diçû û dihat, baş van nakokiyan dizane. Lê newêrin derbarê vê mijarê de biaxivin.

Ocalanê ku 18-19 salan li Suriyê ma bû, baş ketibû bin bandor û kontirola rêjîma Hafiz Esed. Nuha jî, Ocalanê ev 18 sal in (1999-2017) li Îmralı dijî, êdî ketiye bin bandora AKPê û ne mumkin e nekeve bin bandorê. Ji 1978'an û ta 2004an PKKê bi seriyekî dihat birêvebirin. Ji 2004an (piştî Osman Ocalan û gurûpa wî ji PKKê veqetiyan) û ta 2011an PKKê bi du serî dihat birêvebirin, ew jî serên Ocalan û Bayık bûn. Ji 2012an û ta nuha, PKKê tenê bi serê C. Bayık tê birêvebirin.

Ocalan û Bayık ku bi hev re PKKê damezrandin êdî ji hev dûr dikevin. Eger nuha Ocalan ji zindanê derkeve, dê alozî û kirîzeke mezin di nava PKKê rû bide. Lewma hin berpirsên PKKê di civînên kadiro de êdî eşkere dibêjin: em ne mecbûr in hemû perspektîvên Ocalan weke biryar qebûl bikin. Rast e Ocalan serokê me yê îdolojîk e, lê serokê me yê rasteqîn û "fîlî" heval Cuma, C. Bayık e.

Eger wisa be, divê cemawe û derûdorên PKKê xwe hînî vê durişimê bikin: "Bijî serok Cûma".

# Îran dê îtirafê bi serxwebûnê bike

ESKENDER CEIFERÎ



ÎRAN di erdnigariya Rojhilata Navîn de xwedî hêzeke mezin û bi bandor e. Kesek jî nikare vê bandorê ji nedîtînî ve werê. Ji hevpeymaniya şîeyan heya şerê siyasî yê di navbera partiyên Kurdî li beşên cuda yên Kurdistanê dest û dewsên Îranê xuya ne. Niha ku Kurd dixwazin ji bo ji Îraqê veqetin û bigihêjin dewleteke Kurdî, refrandomê dikin. Tirs û nîgeraniya aliyên netewexwaz û nasyonalîst ji dijkiryarên Îranê zêde dibin. Ew dibêjin dibe ku Îran li dijî serxwebûna Kurdan, hemû hêza xwe bi kar bîne.

Rast e serxwebûna Herêma Kurdistanê, meyla cudabûnê di nav Kurdên Rojhilatê Kurdistanê de jî zêde dike. Lê ew hezkirin, bixwe li cem xelkê heye. Îran jî, vê mijarê ji xwe re bi metirsî dibîne. Ji ber ku bi mezinahiya xwe ve di dinyayê de dewleta 18mîn û dewleteke pir-etnîkî ye û nûfusa wî welatî di derdora 77 milyonan de ye. Desthilat ya Farisan e ku eger Azeri, Kurd, Ereb û Belûç jê derkevin, welatê wan biçûk û bê çavkaniyên siruştî ye.

Îran her tim xwe bi xizmê Kurdan binav dike. Lê ti Kurdek li wî welatî nabe xwedî desthilat. Desthilata yekem, ya Farisan e. Navê Îranê di nav zimanên Îranî de tê wateya Herêmên Aryaniyan û ew, Kurdan jî bi Aryayî binav dikin. Lê ji ber ku mezheba fermî ya Îranê şîe û zimanê fermî jî Farisî ye, Kurd tê de xwe bêpar dibînin û bi sedan girtiyên wan yên siyasî hene.

### Îran dixwaze ji Îsraîlê zêdetir nêzîkî Başûr bibe

Li gorî ku Îran dibêje, her kesek ku alîkariya Kurdên Rojhilatê Kurdistanê bike ku li hemberî hikûmetê serî hildin, ew dijberê Komara Îslamî ye. Partiyên Rojhilat jî di nava qedexetiyê de, yan li sînoran in yan jî li nav axa Başûrê Kurdistanê. Îran, Herêma Kurdistanê bi piştevaniya partiyan Rojhilatî tometbar dike. Rast e ku bi dirêjahiya dîrokê rola jeostratejîk a Îranê giring bûye. Sedema vê giringiyê jî cihê wê li navenda Ewrasyayê û mînak jî bandora wê di nav partiyên Başûrê Kurdistanê de ye, lê eger partiyên Başûr lihev bikin û encama refrandomê dengê erê be, dibe ku Îran yekemîn welat be ku îtirafê bi serxwebûna Kurdan dike. Belkî bikare bi vî rengî dengê Kurdên Rojhilatê Kurdistanê jî bifetisîne yan jî kêm û bê bandor bike ku niha ji aliyê siyasî ve parçeyek ji Îranê ne.

Ji xeynî bajarên navborî, Xaneqîn, Mendelî (ku di parêzgeha Diyala de ye), Bedre (ku di parêzgeha al-Wasît de ye) Kurd in. Ji bo ku derkeve holê ka gelo xelkê wan bajaran dixwazin bi ser hikûmeta navendî bin yan jî dixwazin tevlî Herêma Kurdistanê bibin, giştpirsiyek ji bo sala 2007an hatibû amadekirin, lê heta niha ew giştpirsî nehatiye encamdan. Pişt re jî ku Kurdistan mijûlî şerê li dijî DAIŞ bû. Di vê navberê de hevpeymanên Îranê li wan navçeyan hêzên weke Heşda Şeibî ava kirine ku ji Kurdên şîe pêk tên. Armanca wan hêzan xebat li dijî destkeft û xewnên Kurdan e. Ew her wisa di berjewendiya Îranê de dixebitin. Ji ber ku Îran, Kurdistaneke bihêz naxwaze.

### Dibe ku Îran li nêrîna xwe vegere

Piştî ku Kurdan rêveberiya bajaran ji Seddam Husên standibû, demildest Îranê dijatî kir. Lê pişt re hewl da xwe nêzîkî Kurdan bike. Hin siyasetvan, rjftara Komara Îslamî bi Kurdan re, weke ya Rejîma Pehlewî dişibînin li hemberî Statuya parçe-xweseriyê ya ji roja 1970/74 pê ve.

Refsencanî ragihand ku federalî ji bo Îraqê tê wateya avakirina Îsraîleke din û ew jî di berjewendiya Îranê de nîn e. Wî got ew qet îtirafê bi vê federaliyê nakin. Lê dema ku federalî hate standin, yek ji dewletên ku herî zû kunsolxane li wir vekirin, Îran bû. Bi vê pazêlê jî kifş dibe ku eger Îran riyeke din ji xeynî îtiraf bi serxwebûna Kurdistanê nebîne, yan wê hewl bide wan lawaz bike û yan jî soz û peymana neçalakiyê di riya Kurdistanê re ji partiyên Kurdî yen Rojhilatê Kurdistanê bistîne.

Li gora benda yekemîn ya Destûra Herêma Kurdistanê, ew navçe parçeyek ji Îraqê ye û pergala plûral, demokratîk, parlamentarî û komargerî dihewîne. Benda duyemîn jî amaje dike ku Herêma Kurdistanê desthilatê li ser tixûbên beriya 1970î yên parêzgehên Silêmanî, Hewlêr, At'Tamîm, Duhok û navçeyên Akrê, Şêxan, Şingal a Neynewayê û Xaneqîn, Mendelî ya Diyala û Bedre ya Al Wasîtê dike.

## "Îran naxwaze rola wan welatan zêde bibe"

Îran yek ji damezrêner û endamên Neteweyên Yekbûyî, Welatên Alînegir û Rêxistina Welatên hilberînerê Petrolê (OPEC)ê û hevrika sereke ya Erebistan, Amerîka, Tirkiye û Îsraîlê ye. Bi vê yekê jî Îran naxwaze rol û bandora wan welatan û di seriya hemûyan de ya Îsraîlê li Kurdistanê zêde bibe. Her qasî ku berê digot serxwebûna Kurdistanê tê wateya avabûna Îsraîleke din li Rojhilata Navîn, lê eger Kurdistan serbixwe bû, Îran amade dibe vê bacê bide û îtirafê bi wan bike.

Sînorê fermî yê Hêrêma Kurdistanê yê îro û herêmên Kurdistanê ên derveyî desthilata Kurdan de, Kerkûk, Hewlêr, Duhok, Silêmanî, Şingal û beşek ji Mûsilê ne. Li gorî peymana xweseriyê ya 11ê Adara 1970an ku di navbera Mela Mistefa û Seddam Husên de hatiye îmzekirin, mezinahiya herêmê bi 37.000 kîlometrên çargoşe wate parêzgehên Hewlêr, Duhok û Silêmanî. Ew ezmûn ji Kurdan re pir girîng bû. Heta sala 1988an herêm bi parçeyî serbixwe bû. Di roja 19ê Gulana 1992an parlamentoya herêmê ji nû ve hat hilbijartin û Yekîtiya niştimanî ya Kurdistanê 51 kursî û Partiya Demokrat a Kurdistanê jî 49 kursî stendin. Di roja 4ê Cotmeha 1992an de parlamentoyê Kurdistana Federal îlan kir.

## "Îran bi riya hin partiyan bandora xwe nîşan dide"

Her qasî ku Kurd bajarên Kerkûk, Şingal û Mûsilê bixwazin jî, daxwazên wan ji aliyê beşeke zêde ji Erebên Îraqê ve têne redkirin ku tê gotin Îran di riya wan û hin partiyên Kurdî re bandora xwe nîşan dide da ku ew bajarên dewlemend bi petrolê ve nekevine bin desthilata Herêma Kurdistanê. Tirkiye jî carinan behsa Tirkmenan dike û xuya dibe ku ew jî naxwazin Herêma Kurdistanê ji sê parêzgehan mezintir bibe.

Di dema desthilata Komara Îslamî de jî di sala 2003'an de ku Kurdên Îraqê tevî ku bi ser Îraqê ve bûn û karibûn bandora xwe xurttir bikin û herêma xwe mezintir bikin û federaliya xwe standin. Elî Ekber Haşimî Refsencanî ku beriya çend mehan koça dawiyê kir, wê demê serokê saziya Destnîşankirina Berjewendiyên Komara Îslamî bû.





## "Îran li benda biryara xelkê Kurdistanê ye"

Weke ku çawan di dema derbeya leşkerî de ya ku li Tirkiyê bi serneket, Îranê zû helwesta xwe nîşan neda, niha jî li benda biryara xelkê Başûrê Kurdistanê ye. Beriya niha Elîriza Ayetî şêwermendê wezarata serve ya Îranê gotibû serxwebûna Kurdistanê wê Rojhilata Navîn bihejîne û DAIŞ û Israîl wê sûdê ji parçebûna Îraqê bibînin. Lê niha Îran ewqasî nermtir bûye ku şandeyên Herêma Kurdistanê li ser vê mijarê serdana wî welatî dikin.

Beriya heyamekê şandeke bilind a Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê bi serokatiya Selehadîn Bahadîn sekreterê giştî serdana Tehranê kir û bi Elî Larîcanî serokê Parlamentoya Îranê, Elî Ekber Wîlayetî şêwirmendê Elî Xamineyî û herwiha hejmareke din ji berpirsan re civiyabû. Wê demê, berpirsên Tehranê diyar kiribûn ku ew dikarin bi şert, serxwebûna Kurdistanê qebûl bikin. Yekgirtiyê bi eşkere got, eger Bexda pabendî destûrê nebe, mafê Herêma Kurdistanê ye, ku bijardeyên din hilbijêre û bi teybetî jî serxwebûnê. Îranê jî got ku eger pirsgirêk bi riyên aştiyane bêne çareserkirin, serxwebûna Kurdistanê ji bo Îranê nabe gef û ew dikarin xweşbîn bin.



EKREM ÖNEN

## Kurdolojî: Ji Rûsya Qeyserî heta îro

Kurdolojî: Wek ilmekî komplekt bingehîn dema di enstîtû an dezgeheke ilmî de, li ser ziman, folklor, edebiyata klasîk û serdema nû, dîrok, geopolîtîka, etnografiya, coxrafya, medya û xwezaya (dewlemendiya ser erd û bin erd), Kurdan ku ji alî akademîsyena xebatên îlmî têne kirin.

Kurdolojî li Rûsya Qeyserî (Çarlik) di nava orîentalîzmê de wek ilmekî serbixwe hate dayîn. Destpêka Kurdolojî li Rûsya Qeyserî em dikarin bêjin piştî heremên pişt Kafkasya ketin nava axa Rûsya Qeyserî û piştî ku Rûsya Qeyserî di siyaseta xwe de berê xwe da rojhilata nêzîk û navîn şerê bi Tirk û Farisan re destpê dike. Di destpêkê de bi pirsa Kurdan kesên diplomat, leşker û siyasetvan eleqedar dibûn, paşê seyahên Rûs A.Î. Averyanov, A.M. Kolyubakîn û geleke din ku gelek dokûment û destnivîsên derbarê Kurdan de civandin, bû sebeb ku li Zanîngeha Sanktpetersbûrgê li ser dîrok, ziman, ol û edebyata Kurda lêkolînên hêja bêne afirandin. A.D. Jaba, N.Y. Marr, B.A. Gordevskov, Î.A. Orbelî, S.A. Egîazarov û hwd. Xebata hêja a V.F. Mînorskî. Kurdolojî li Rûsya Qeyserî bingeheke zanistî avakir bû cihê jêderê ji bo rojhilatnasên welatên rojava jî.

### Kurdolojî li Yekîtiya Sovyetê

Di serdema Sovyetê de tradîtsiyona Kurdolojî berdewam kir, kesên ji ekola kevn yên wek N.Y. Marr û Î.A. Orbelî bi qadroyên nû yen wek Kanadê Kurdo, M.B. Rûdenko û O.L. Vîlçevskî Kurdolojî pêşde birin. Di serdema Sovyetê de pêşketina Kurdolojiyê mirov dikare dabeşî çend qonaxa bike. Ji destpêka 1920an û 1930î yê qirnê XXan ji ber sebebên praktîkî pêşket. Ji 1923an heta 1929an heremeke otonom bi navê Kurdistana Sor hebû. Li wê derê li dibistana perwerda zarokan bi Kurdî bû her weha li Ermenîstanê enstîtûtya pedagojî a Kurdî hate avakirin. Di 1930î de rojnameya Riya Teze hate weşanadin. Di 1936an de Narodnî Komîsar li Ermenîstanê biryar girtin ku folklora Kurdî a devkî berhev bikin, ev kar dan Heciyê Cîndî, Emînê Evdal û kompozîtor Karro Zakaryan. Di 1934an de meha temûzê konferansa kurdologên Sovyetê çêbû. Her weha di vê serdemê de rewşenbîrê Kurdên Sovyetê dest bi xebatên li ser ziman, edebiyat û folklora Kurdî kirin. Gelek berhemên bi Kurdî çap kirin. Şerê cîhanê yê duyemîn rewşeke nû li cîhanê çêkir tesîra wê li Kurdolojî jî kir. Li ser parvekirina cîhanê ji nû de heremên rojhilata nêzîk û navîn bûn cihê balkêşiyê. Sovyet wek hêzeke navnetewî xwedî hesab bûn li ser vê herêmê, bi taybetî li ser Kurdan. Wek mînak di vê serdemê de em dibînin di derbarê Kurdan de, di rojnameya Zarya Vastoka de gelek behsa Kurda tê kirin herwiha di 1944an de li Tîblîsê pirtûka O.L.Vîlçevskî a bi navê Kurdên bakurê-rojavayê Îranê tê çapkirin her weha di 1955an de radyoya Erîvanê dest bi weşanê dike serokatiya wê Casimê Celîl paşê Xelîlê Çaçan dike. Qonaxa dudoyan ji 1960î destpê dike. Bi hatina Mustefa Barzanî a Sovyetê tesîreke mezin li aktîv bûna Kurdolojiyê dike. Di salên 1960-1980an de li Lenîngrade kurdologan karên xwe yî bingehîn dewam dikirin. Navendên Kurdolojiyê her weha li Moskow, Rewanê û Tîblîsê hebûn. Di dawiya 1970î de akademiya zanîstî a Sovyetê biryar girt ku beşekî Kurdolojî veke, bi vî karî M.A Hasretyan rabû. Di 1982an de li Lenîngradê dora 30 Kurdologî ji Moskow, Lenîgrad, Semerkant, Rewan û Tîblîsê civiyan, biryar girtin navendek Kurdolojî ava bikin ev navend di 1984an de hate avakirin. Ji 1982an heta belav bûna Sovyetê beşê Kurdolojî gelek karên serkeftî û berhemên di derbarê dîrok, ziman, etnografiya, coxrafiya, xweza geopolîtîk, ferhenga etîmolojiyê, ferhenga Rusî-Kurdî, Kurdî-Rûsî, medya û gelek berhemn din çap kirin.

### Kurdolojî Li Rûsya Federal

Piştî belav bûna Sovyetê gelek Kurdolog man li derveyî Rûsya, li Rûsya du navendên Kurdolojî man yek li Moskow yek li Sanktpetersbûrg. Li Moskow bêhtir dîrok, geopolîtîk, medya û xweza, li Sanktpeterburg ziman, edebiyat, folkor û coxrafya kar kirin. Di 2008an de radyoya dengê Rûsya beşê Kurdî dest bi weşanê kir. Di 2016an de Zanîngeha Moskow dest bi xwendina ziman û dîroka Kurdî kir. Niha jî gelek qadroyên nû Kurdolog parastina doktora li ser Kurdan dikin. Wek mînak beriya du hefta xanima Anjelîka Olegovna Pabedonostsevakaya doktora xwe li Sanktpetersburgê li ser "Kurd di Tarîx û Siyaseta Rûsya a Rojhilata Nêzîk de, di Qirnê XIXan û destpêka Qirnê XXan de." Ez yek ji du Oponentê wê bûm. Min teza wê pir bi diqet xwend û otziv ji bo parastinê nivîsî. Ji ber xanima Anjelîka bi Tirkî dizanê û li arşîvên Rûsya û li Tirkiyê, li Osmaniyan kar kiriye. Di salên dawî de gelek tez di derbarê Kurdan de hatine parastin. Her dewlet ji bo berjewendiyên xwe li ser Kurdan lêkolînan dikin Rûsya jî weha dike. Bes ji berhemên Kurdologên Rûsya Kurd dikarin bigihin gelek dokumentê dîrokî. Rûsya niha jî di warê Kurdolojî de wek komplekt ilmekî bingehî navenda Kurdolojî li cîhanê ye. Li gelek welatan li ser Kurdan xebatên hêja tên weşandin, lê li tu welatan wek komplekt, enstîtûyek bi gelek akademîsyen li ser hemû babetên Kurdolojî kar bike nîne. Li Rûsya Kurdolojî wek ilm, perçekî orientalîzmê bi serê xwe ye.

Rêveberiya Reqayê diyar bû

# Encûmena sivîl dê Reqayê birêve bibe




Reqa dê piştî rizgarkirinê çawa bê rêvebirin, diyar bû. Civîna Damezrêner a Encûmena Sivîl a Reqayê û Komiteya Amedekar di 18 Nîsana 2017'an de ji bo biryargirtina rêveberiya Reqayê li Eyn Îsaya navçeya Girê Spî kom bûn. Encûmen ji 110 delegeyên ji pêkhateyên herêmê û ji sedî 80 ji Ereban û ji sedî 20 jî ji Kurd û Tirkmenan pêk tê û ji wan 14 jî jin in.

**SAHRA AMEDÎ**

**OPERASYONA** rizgarkirina bajarê Reqayê ku weke navenda DAIŞ'ê ya Sûriyê tê zanîn bi hemû hêz û leza xwe berdewam dike û HSD gav bi gav ber bi navenda bajêr ve bi pêş de diçe. Piştî operasyonê ku di Mijdara 2016'an de dest pê kir, nîqaşên derbarê rêveberiya bajêr a piştî operasyonê jî di rojevê de cihê xwe girt. Hêzên Sûriya Demokratîk radigihandin dema ku bajar ji destê DAIŞê hat derxistin û paqijkirin, wê radestî xwecihên deverê were kirin û encûmeneke sivîl wê Reqayê birêve bibe. Herwiha hat zanîn ku lêgerîn û xebatên ji bo rêvebirina bajêr, beriya operasyonê destpêkirine û 6 mehan komîteyeke amadekar ku ji 9 kesan pêk tê di derbarê rêveberiya bajêr de bi eşîr û niştecihên deverê re hevdîtin kirine û nêrînên wan wergirtine. Piştî lêkolîn, xebat û gûftûgoyên bi xelkê herêmê re Encûmena Sivîl a Reqayê bi awayekî fermî hat ragihandin.

Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) ku pêşengiya wê YPG dike û ji aliyê hêzên hevpeyman ve tên piştevanîkirin di çarçoveya operasyona Xezaba Feratê de ku niha qonaxa 4an birêve dibe de nêzikî navenda bajarê Reqayê bûn. Piştî pêşveçûna hêzên Kurdî û hevdîtinên bi eşîrên herêmê re li bajarokê Eyn Îsayê Rojavayê Kurdistanê, Civîna Damezrêner a Encûmena Sivîl a Reqayê û Komîteya Amedekar di 18 Nîsana 2017'an de bi mijara rêveberiya Reqayê ya piştî operasyonê kom bûn.

Civîn bi beşdariya 110 delegeyên Kurd, Ereb, Tirkmen, ciwanên ji Reqayê, ronakbîr û Hevseroka Meclîsa Sûriyeya Demokratîk (MSD) Îlham Ehmed, Hevserokê Meclîsa Qanûnsaziyê ya Minbicê Farûk Maşî, Hevserokên Encûmena Rêveberiyê ya Minbicê Îbrahîm Qeftan û Zeynep Qenber, Hevserokê Rêveberiyê Xweseriya Demokratîk a Girê Spî Hemdan Ebd, Berdevkê HSDê Telal Silo, Berdevka Odeya Çalakiyan a Pêngava Xezeba Feratê Cihan Şêx Ehmed û endamên MSD'ê beşdarî civînê bûn.

Di civînê de ji bo rêveriya Reqayê biryarên girîng hatin girtin û rêveberiya ku dê bajêr birêve bibe hat hilbijartin. Endamê MSDê Umar Elûş encamnameya civînê ragihand û got: "Beşdaran Encûmena Sivîl a Reqayê ava kirin da ku bajar piştî rizgarkirinê ji aliyên dada civakî, xizmetên tendûristî, parastin, xwendin, jin, ciwan û ragihandinê ve were rêvebirin." Leyla Mistefa û Şêx Mehmûd Bersan ji bo Hevserokatiya Meclîsê hatin hilbijartin. Di civînê de ev biryar jî hatin girtin; Divê şêniyên bajêr vegerin ser warên xwe, xebatên parastina bajêr bên xurtkirin, sazî û dezgehên ku ziyan dîtine ji nû ve bên avakirin. Piştî ku bajar hat rizgarkirin, Encûmen dê bo navenda Reqayê bê vegûhestin û dê ji nû ve were avakirin. Encûmen ji sedî 80 ji Ereban û ji sedî 20 jî ji Kurd û Tirkmenan pêk tê û ji wan 14 jî jin in.





### Hêzên asayîşê tên perwerdekirin

Hevseroka Encûmena Sivîl a Reqayê Leyla Mustefa ji Heftenameya Basê re li ser proseya piştî rizgarkirina bajêr sekinî û diyar kir ku piştî operasyonê HSD dê Reqayê radestî Encûmena Sivîl a bajarê Reqayê bike. Encûmen wê ji nû ve were avakirin û were berfirehkirin.

Li gorî zanyariyên hatine bidestxistin ji bo parastina Reqayê, li Eyn Îsayê ji aliyê HSD'ê ve hêzên asayîşê tên perwerde kirin.

### Leyla Mistefa: Daxwaz a gelê Reqayê bû

Leyla Mistefa ku weke Hevseroka Encûmena Sivîl a Reqayê hat hilbijartin derbarê civînê de ji Heftenameya Basê re axivî û got: "Piştî ku operasyona Reqayê dest pê kir, pêwistiya encûmeneke medenî diyar bû. Ji xwe daxwaza gelê Reqayê jî ev bû û piştî xebata 6 mehan encûmen hat avakirin. Niha hin nûnerên me li derveyî Sûriyê ne. 22 jê jin, 110 delege beşdar bûn. Li gorî pêdiviya xelkê û xizmetgûzariyên bajêr, 14 komîte hatin avakirin. Piştî operasyonê encûmen dê were berfirehkirin. Biryarên hatine girtin, yên xelkê herêmê bi xwe ne. Piraniya şêniyên Reqayê Ereb in û li gorî vê yekê encûmen ji sedî 80 ji Ereban û ji 20 jî ji Kurd û Tirkmanan pêk tê. "

Mistefa di berdewamiya axaftina xwe de eşkere kir ku HSD deverên ku heta niha ji destê DAIŞê rizgar kirine radestî encûmenê kirin û deverên ku dê werin rizgarkirin jî bi heman awayî dê radestî encûmenê werin kirin.



## ENKS dest bi vekirina nivîsgehên xwe dike

Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriye (ENKS) ku nivîsgehên wê hemû ji aliyê asayîşa bi ser PYD'ê ve rastî êrişan hatibûn û hatibûn girtin, dest bi vekirina ofîsên xwe dike. Piştî girtinan ENKSê di 18'ê Nîsanê de nivîsgeha xwe ya yekem li Qamişloyê vekir û dest bi xebatên xwe kir. Rayedarên ENKSê ragihandin ku ew dê li seranserê Rojavayê Kurdistanê nivîsgehên xwe ji nû ve vekin û karûbarên xwe berdewam bikin. Lêbelê zextên asayîşa PYDê yên li ser partiyên Kurdî bi dawî nebûne û dixwazin nivîsgehên partiyên Kurdî dîsa bigirin.

Asayîşa bi ser PYD'ê ve di meha Adarê de piştî ku Pêşmergeyên Roj li ser sînorê Rojavayê Kurdistanê bicih bûn, destbi şewitandin, rûxandin û girtina nîvîsgehên ENKSê kirin û hemû nivîsgehên ENKSê hatin girtin û bi dehan endamên ENKSê jî hatin girtin. Asayîşa PYDê di meha Adarê de nêzî 50 nivîsgehên partiyên Kurd girtin. PYD hinceta girtinan jî weke ku destûrname (rûxset) ji 'Rêveberiya Xweser' ve wernegirtine diyar dike, lêbelê ji destpêka desthilata PYD'ê ya li Rojava ve û heta niha bi taybet ENKS û bi dehan partî, komele û rêxistinên ku di nava desthilata wan de cih nagirin û ne di îdeolojiya wan de ne şewitandin û girtin. Herwiha bi dehan kesayet û siyasetmedarên Kurd niha di zîndanên PYD'ê de ne.

Serokê ENKSê Îbrahîm Biro jî ragihand ku ew dê li seranserê Rojavayê Kurdistanê nivîsgehên xwe ji nû ve vekin û xebatên xwe bidomînin.

Cîgirê Sekreterê Partiya Yekîtî Hesen Salih ji Heftenameya Basê re axivî û li ser helwesta PYDê nerazîbûneke tûnd nîşan da. Salih herwiha diyar kir ku wan heta niha tevî hemû zext û zordariyan jî ji rejîma Sûriyê destûr wernegirtiye û ew destûrê ji tu kesî din jî wernagirin. Salih di derbarê vekirina nivîsgehan de jî got ku ew ê hemû nivîsgehên xwe vekin.

Salih: Em dê ji PYDê ti rûxsetê wernegirin

Cîgirê Sekreterê Partiya Yekîtî Hesen Salih rejîma Baas û PYDê dide ber hev û dibêje: "Me di dema rejîma Baasê de rûxset wernegirt. Rejîmê gelek zilm û zordarî li me kir, PYD jî xwe xûrt û bihêz kir û bi riya çekan xwe li ser Kurdistana Rojava. Ev ti carî nayê pejirandin. Ji ber ku em jî weke partiyeke Kurdistana Sûriyê ji 1957'an heta niha nûnertiya gelê xwe dikin û berevaniyê di ber pirsa Kurd de dikin. Ne rast e ku partiyek were û bi rêya çekan kar û çalakiyên me yên siyasî qedexe bike û em qebûl nakin."

Salih di dirêjiya axaftina xwe de ragihand ku ew dê ji tu deran destûrê negirin û wiha berdewam kir: "Em dê ji PYDê ti rûxsetê wernegirin. ENKS jî biryar da ku bi rengekî aştiyana biçe û ofîsên xwe veke. Em naxwazin ne xweşiyek rû bide û em ê li hemû bajarên Rojava nivîsgehên xwe vekin. Me nivîsgeha xwe ya yekem li Qamişloyê vekir."

"Em naxwazin arîşe derkevin"

Salih di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser aştiyê û wisa pê de çû: "Em nazwazin arîşe û nakokî derkevin. Em ê berê xwe bidin karên aştiyane. Çi Kurdistanê be, çi Ewropayê be, çi Amerîka be, ferq nake. Em ê hewl bidin ku vê deshilatdarî û zexta PYDê ku li ser gel heye, çareser bikin. Ji ber ku li Rojavayê Kurdistanê hin jî hilbijartin çênebûne. Hêzên leşkerî li hemû cihan cih digirin û xelkê dieşînin. Em ê bi vî rengî qebûl nekin."

## Çarenivîsa 4 fermandarên Kurd ne diyar e

Ev çar sal in ti agahî ji 4 fermandarên Kurd ku ji Artêşa Sûriyê veqetiyabûn û xwastibûn xwe bigihînin Herêma Kurdistanê nayên wergirtin.

Li Rojavayê Kurdistanê 4 fermandarên Kurd roja 16 Nîsana 2013'an dema ku ji Artêşa Sûriyê veqetiyan û dixwastin xwe bigihînin Herêma Kurdistanê, nêzîkî Dêrika Hemko têkilî bi wan re qut bûbû û ti agahî ji wan nehatibûn girtin û heta niha jî nayê zanîn ku çi hatiye serê her 4 fermandarên Kurd.

# Piştî referandûmê; Rojeva Kurdan aboriya herêmê ye



Di referandûmê de li hin bajarên bakurê Kurdistanê 'Erê' li hin bajaran jî 'Na' derket pêş. AKP di wê baweriyê de ye ku li herêmê dengên xwe zêde kirine, HDP jî di vê baweriyê de ye ku operasyonên li herêmê bandor li ser dengên 'Na' kiriye. Gelên herêmê jî êdî pevçûn û operasyonan naxwazin; li benda gavên siyasî û reformên aborî ne."

Piştî hilbijartinên 7 Hezîranê pevçûnên di navbera PKKe û hêzên dewletê de bandoreke neyênî li ser jiyana civakî û aborî kir. Di referandûma 16 Nîsanê de mijara ku herî pir hat nîqaşkirin jî rewşa Kurdan bû. Raya giştî ya Kurdan li bendê ye ku piştî referandûmê şerê li bakûrê Kurdistanê rû dide bi dawî bibe û ji bo aboriya herêmê baştir bibe gavên nû bên avêtin.

Serokên Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê yên bakûrê Kurdistanê dibêjin "Pevçûnên ku du sal in berdewam dikin xisarên mezin daye herêmê, divê piştî referadûmê hem gavên siyasî hem jî yên aborî bên avêtin" Ji aliyê din ve Serokên Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê (TSO) yê herêmê di wê fikrê de ne ku piştî referandûmê 'Erê' encam da têkiliyên di navbera herêma Kurdistanê û Tirkiyeyê jî. Serokê Komeleya Karsazên Ciwan yê Başûr-Rojhilat (TÜGİAD)ê Hakan Akbal "Di hilbijartina referandûmê de hilbijêrên Kurd xwestin peyamekê bidin Serokkomar Erdoğan." Serokê Komeleya Karsaz û Pîşesazên Başûr-Rojhilat (GÜNSİAD)ê Şah İsmail Bedirhanoğlu "Li herêmê hêviyeke wiha heye ku piştî referandûmê aboriya herêmê ber bi başiyê ve biçe"

**"Referandûm bi dawî bû, em li benda pêşketina aboriyê ne"**

Li bakûrê Kurdistanê nîqaşên rêjeya dengan ya li ser siyasetê berdewam dike herwiha reformên hikûmetê yê ji bo herêmê jî tê gotûbêj kirin. Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziya Colemêrgê Servet Taş ''Em li bendê ne ku hikûmet projeyên xwe yên aboriya herêmê di 8 mehan de pêk bîne. Hikûmetê sala berê ji bo herêmê biryar dabû ku navendên cazîbeyê damezrînin. Vê projeyê di nav karsazên herêmê de kelecanek çêkir. Em jî li bendê ne ku ji bo pêşketina aboriyê gav bên avêtin. Ji bo karxaneyan ji 40'î zêdetir fîrmayan serî li me da. Ji bo damezirandina karxaneyan û veberhênan (yatırım) bên kirin û diyarkirina fîrmayan di navbera 1-2 mehan de, dê diyar bibe. Ez di wê baweriyê de me dê hikûmet piştî referandûmê ji bo aboriya herêmê piştgiriyeke mezin bide. Bi derfetên xwe veberhêneya Colemêrgê gelekî zehmet e. Pêdiviya me bi piştgiriya dewletê heye. Esnaf û kesên bi bazirganiyê re mijûl dibin hêviya wan ew e ku piştî referandûmê piştgiriyek bo wan bê kirin.

**"Her ku veberhênan zêde bibe dê bêkarî jî kêm bibe"**

Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziya Şirnexê Osman Geliş diyar dike ku ''Hin projeyên navendên cazîbeyê û yasayên teşwîqkirinê yê hikûmetê heye, gel êdî bendê ne ku piştî referandûmê ji bo aboriya herêmê hikûmet veberhênan bikin. Geliş dibêje "Herku veberhênan zêde bibe dê bêkarî jî kêm bibe" û wiha berdewam dike "Beriya referandûmê ji bo navendên cazîbeyan vebin, bo 23 bajaran ev proje hatibû rojevê. Êdî referandûm encam da, divê ev proje jî bên cîh. Heger ev proje pêk bê li herêmê dê bêkarî kêm bibe û pêşketinek pêk were."

Serokê TÜGİADÊ Hakan Akbal Dibêje "Kurdan di referandûmê de bi dengên 'Erê' ji xwe re 2 kredî vekirine yek ji van di warê siyasetê de pêvajoya çareseriyê were rojevê, ya din jî Ji bo di warê aborî de livandinek li herêmê pêk were, veberhênên nû çê bibin.

Serokê GÜNSİADê Şah İsmail Bedirhanoğlu:

## Hewaya siyasî bandorê li aboriyê dike

"Tirkiye di heyameke xetere ya referandûmê de derbas bû. Divê her kes rêzê li encaman bigire. Ez li bendê me ku encamên referandûmê bandoreke erênî li jiyana me ya aborî bike. Kurdên herêmê him ji bo çareseriyê him jî bo başbûna aboriyê dengên xwe bo aliyê 'Erê' bikar aniye. Gelên li herêmê di wê fikrê de ne ku piştî referandûmê wê aboriya herêmê ber bi başiyê ve biçe. Jixwe li herêmê di warê aboriyê de tengasî heye. Pevçûnên ku nêzî du salan e didomin aborî ber bi xerabiyê ve bir. Lê civak hêdî hêdî ber bi asayîbûnê ve diçe. Di wê baweriyê de me ku hêviya ku piştî referandûmê ketiye nav mirovan dê pêk were. Dema pevçûn rû nede dê geşdarî jî bilind bibe. Li herêma me hewaya siyasî her tim bandorê li rewşa aborî dike. Piştî referandûmê dê têkiliyên aborî yê di navbera Tirkiye û Herêma Kurdistanê de jî ber bi başiyê ve biçe. Ez di wê fikrê de me ku di demên pêş deriyê sînoran bêhtir aktîf bibe.

Serokê Odeya Bazirganî û Pîşesaziyê yê Wanê Necdet Takva:

## Hêviyên mirovan hene

"Mirovên herêmê him li benda gavên siyasî û him jî li benda yê aborî ne. Bi referandûmê re destûra nû ne tenê bo siyasetê gavan biavêje, gel li bendê ye ku bo aboriyê jî gav bên avêtin. Li herêmê pirsgirêkên mezin yê aborî hene. Bendewariyek mezin ya esnaf û bazirgana heye. Ji bo xurtkirina avahiyên bingehîn yê bajaran jî ev bendewarî didome. Di navbera herêma herî mezin û ya biçûk 8 qat heye. Em li benda gavên marjînal û radîkal in. Mesela em bibêjin para dahatûya ne sade ya Tirkiye 24 hezar dolar e, ji bo başbûna veberhênan divê di navbera herêman de ferqa pêşketinê ji holê rabe û divê xebat bê kirin. Heta ku xebatên wiha neyên kirin li Tirkiyeyê dê pirsgirêkên kûr çê bibin. Di navbera herêman de jî dê koçberî zêde bibe. Divê jê re çareyek bê dîtin.

# Gelo ji kizwanê çawa sabûn tê çêkirin?



GÖNÜL GÜN

ESNAFÊN Mêrdînê dibêjin ev deh salên dawî piştî ku geştiyarî gêş bû sabûnên ji kizwanê tênê çêkirin elaqeyeke mezin dîtiye. Esnaf dibêjin wekî din, ji bili niştecihên bajêr geştiyarên biyanî jî zêdetirîn van sabûnan dikirin.

Kizwana ku wekî fistiqa biyanî tê zanîn û bi Kurdî 'Kizwan/ Kezwan', bi Tirkî 'Menengiç/Çitlenbik', 'bi Erebî Bitim ' tê bi nav kirin. Kizwan ne tenê cureyê fistiqê ye di heman demê de ji kizwanê sabûn û qehwe jî tê çêkirin. Li bajarên mîna Mêrdîn, Sêrt û Dîlokê digihêje. Gava ku fistiqa kizwanê gihîşt, bi zehmetiyeke mezin tê berhev kirin. Ji bo ku sabûnek baş û biqalîte çêbibe wext û kedeke zêde pêwîst e. Li bajarên wekî Mêrdîn, Sêrt ji kizwanê sabûn û qehwe tê çêkirin.

**"Dema ku sabûn tê çêkirin tenê rûnê fistiqê tê bikaranîn"**

Feyzî Gerehan ku esnafek ji Mêrdînê û di heman demê de



elaqedarê giyayan e dibêje, ji kizwana ku nehatiye lûl kirin re 'menengiç' ya ku hatiye lûl kirin re 'kizwan' tê gotin. Gerehan destnîşan dike ku sabûnên ji kizwanê bi awayên cûrbicûr têne çêkirin. Berê bi riya xweliyê sabûn dihatin çêkirin. Gerehan dibêje niha jî an bi riya madeya kostîkê an jî bi usûlê kelandinê sabûn tê çêkirin. Dema ku bi kostîkê tê çêkirin, di nav 10-15 deqîqayan de çêkirina sabûnê xilas dibe. Ger bi riya kelandinê bê çêkirin wê demê wext û kedek zêde lazim e. Firoşkarê sabûnê Gerehan derheqê çêkirina sabûnê de wiha diaxive;

"Li gorî rêje û qelîteya rûnê fistiqê, sabûn tê çêkirin. Dema ku sabûn tê çêkirin helbet bi tenê rûnê fistiqê tê bikaranîn û madeyên kîmyewî divê neyê bikaranîn. Lê belê dema ku sabûn tê çêkirin, hin kes rûnê hestî û hinek jî rûnê pembû dixin nava sabûnê. Bi vî awayî sabûnên baş çênabin." Wekî din, Gerehan dibêje sabûnên bi rûnê zeytûn û defneyê tênê çêkirin sabûnên herî biqalîte ne.

**"Kîloya sabûna kizwanê a resen ji 30 lîreyê dest pê dike"**

Gerehan amaje dike ku ji fistiqa kizwanê, sabûna kizwanê û menengiç tê çêkirin. Dîsa Gerehan tîne ziman her çiqas niha çêkirin û firotina van sabûnan zêde be jî sabûn tevî ked û qîmeta xwe bi awayekî erzan têne firotin dibêje û wiha pê de diçe;

"Gelê Mêrdînê sabûna kizwanê gelek dikire. Lê gelek meriv dema ku rengê zer û kesk dibînin, hema dibêjin 'ev sabûn kizwan û menengiç in.' Niha li bazaran kîloya sabûna kizwan a 7 lîreyî heye. Lê kîloya kizwana resen ji 30 lîreyê dest pê dike. Herwiha heba van sabûnan jî 5 lîreyan tê firotin."

**"Me sabûna kizwanê firote Fransayê"**

Sabûna kizwan ji xeynî bala geştiyarên niştecih bala



geştiyarên biyanî jî dikişîne. Dema ku geştiyarên biyanî têne Mêrdînê sifteh sabûna kizwanê dikirin. Gerehan diyar dike ku geştiyarên biyanî gelek elaqe nîşanê behna sabûnan didin. Gerehan tîne ziman malpera wan a kargehê heye û wiha xeberdana xwe didomîne;

"Em bi riya malpera xwe ji derveyî Mêrdînê re sabûnan difiroşin. Ne bi tenê derveyê Mêrdînê heman demê sabûnan difiroşin derveyê welêt jî. Di demeke nêz de me sabûn firotin Fransayê."

Gerehan, ji vî karî debara xwe dike û dibêje her çiqas qezenca vî karî têra wî bike jî balê dikşîne ser zehmetiya vî karî û bihayê kizwanê.

**"Geştiyarên biyanî qehweya kizwanê gelek diecîbînin"**

Yek jî ji fistiqa kizwanê tiştê ku tê çêkirin 'qehweya kizwan e' ye. Esnafa Mêrdînî Nezihe Çelebioğlu diyar dike ku piştî ku kizwan tê berhevkirin di coniyan de tê kûtan da ku kizwan nerm bibe û rûnê xwe berde. Çelebioğlu balê dikişîne ser feydeyên kizwanê û wiha diaxive;

"Feydeyên qehweya kizwanê bo tendurîstiyê gelek in. Di serî de bronşît û bêhnetengî, gelek tiştan pak dike. Wekî din, qehweya kizwanê him ji aliyê geştiyarên niştecih him jî ji aliyê yên biyanî ve gelek tê ecibandin û qehweya kizwanê zêdetir tê firotin. Em ji derveyî Mêrdînê jî sîparîşan digirin."

## Feydeyên kizwanê çi ne?

Feyzî Gerehan destnîşan dike ku rûnê kizwan û menengîçê gelek bi qîmet e. Li gorî Gerehan sabûn çiqas bê sekinandin evqas rind dibe! Gerehan balê dikişîne ser feydeyên van sabûnan û diyar dike ku feydeyên kizwan û menengiçê bo tenduristiyê gelek in û wiha berdewam dike;


"Kizwan weşîna por kêm dike, por ji kepekê xilas dike, di heman demê de sabûna kizwan ji nexweşiyên çermî re jî derman e. Herwiha nexweşiya warîsê jî rehet dike."

## Mirov çawa sabûna resen û ya sexte ji hev derdixe?

Feyzî Gerehan balê dikişîne ser reseniya sabûnê û dibêjê ji ber ku bûhayê sabûna resen zêde ye, ger bûhayê sabûnê erzan be bila kiriyar bikevin şikê! Bûhayê sabûna resen a kizwanê ji 30 lîreyê dest pê dike dibêje û wiha didomîne;

"Ji bo sabûna menengiçê jî rewş heman e. Wekî din, sabûna ku bi madeya kostîkê hatiye çêkirin porê meriv hişk dike. Tevî van cûdahiyan, gelek caran ji ber ku rengê sabûnan mîna hev in sexteyên van sabûnan, zêdetir tên firotin."

# "Me digot Hîtler mir û careke din venagere"



Li Enfalê 'Jenosîda li dijî Kurdan' ku li demê hat belavkirin, kîmyabarana ewilî li Geliyê Balîsan pêk hat. Heta niha hejmara qurbaniyên li Balîsanê nayê zanîn û êrişan bi dorpêçên Sergelî û Bergeliyê û herwiha bi gundên Şanexşe, Helepçe, Keredag, Germiyan û Ekserê dewam kir û ji destpêka sala 1986'an heta 1989'an berdewam kirin.



MEHRUF HESEN

Di sala 1986'an de bi fermana Serokê Rejîma Baas Sedamê dîktator, li Başûrê Kurdistanê li dijî Kurdan Hereketa Enfalê hat destpêkirin. Vê hereketê navê ji sûreta Kuranê Enfalê ku parvekirina xenîmetên şer vedibêje, digirt. Lêbelê her çiqas ev wek 'Hereketekê' bê zanîn jî, di rastiyê de ev jenosîda li dijî Kurdan bû.

Li Enfalê 'Jenosîda li dijî Kurdan' ku li demê hat belavkirin, kîmyabarana ewilî li Geliyê Balîsan pêk hat. Heta niha hejmara qurbaniyên li Balîsanê nayê zanîn û êrişan bi dorpêçên Sergelî û Bergeliyê û herwiha bi gundên Şanexşe, Helepçe, Keredag, Germiyan û Ekserê dewam kir û di jenosîda ku ji destpêka sala 1986'an heta 1989'an berdewam kir û bi komkujiya Helepçê gihişte asta herî jor jin, zarok mêr, pîr bi mangayên mirinê û çekên kîmyewî hatin qetilkirin.

Jenosîda Enfalê, ji aliyekî din ve vegerîna birdoziyên netewperest ên li ser erdnigariya Kurdan bo jenosîdê radixe ber çavan… Enfalê di vê çarçovê de ji cîhanê re ev tişt qîra kir; "Tenê encameke îdeolojiyên netewperest heye, ew jî ez im!" Digel ku di ser Enfala ku hê jî ji aliyê cîhanê ve weke 'jenosîd'nehatiye naskirin ve ji çaryekeke sedsalê zêdetir dem derbas bûye jî, hêj ji sedî 80ê gorên qurbaniyan nehatine dîtin. Nemaze jî kuştina mêrên Kurd di Enfalê de armanca hereketê ya ku bi taybet bo jinavbirina nivşên nû pêk hatiye radixe ber çavan. Di Enfalê de zêdetirî 100 hezar jin jî mêrên wan kûştin. Herwiha li dijî 'Jenosîda Enfalê' ku di dîrokê de weke rûpeleke reş cihê xwe girtiye û di hişên



Kurdan de wek roja ewilî nû ye, wê demê ne DYA, ne Yekitiya Ewropayê û ne jî Netewên Yekgirtî dengê xwe kirin û bertek nîşan nedan.

**Mirovahiya di nava heriyê de**

Di jenosîda Enfalê de ku di 14ê Nîsana 1986'an dest pê kir û di 1989'an de li Zaxoyê bi dawî bû de, her bûyer û êrişa dihat kirin ji ya berî xwe mezintir û hovtir bû. Êrişên kimyewî, binaxkirina bi saxî, 'ji holê rakirina yên mayî', zorokên ku bi bêhna sêvan hatin qetilkirin û dawîn jî bi vekirina deriyên Bendava Golanê ji aliyê Sedam Hisên ve û hatina mirina ligel heriyê… Enfal di heman demê de navê şîna herî dirêj ya di dîrokê de ye. Ji wê rojê û vir ve taybet jî jinên herêma Barzanê bi lixwekirina cilên reş şîna xwe berdewam dikin…

**Sedam ji ber Enfalê nehat darizandin!**

Wek gotina Kurdekî ku ji jenosîda Enfalê rizgar bûye; "Me digot Hîtler mir û êdî venagere, lê me nedizanî ku kurê wî li Bexdayê mezin dibe…" Hîtlerê Îraqê Sedam Hisên, ji ber Jenosîda Enfalê nehat darizandin. Tenê ji ber komkujiya Dujaîl ku 1982'an de qewimî bû, bo cezayê mirinê hat birîn. Ali al Hasan Al Majid (Pismamê Sedam Hisên) ku digot 'Li geliyê Hewlêrê tenê maleke ku nehatibe şewitandin divê nemîne' û weke 'Eliyê Kîmyewî' dihat naskirin, ji ber Jenosîda Enfalê hat darizandin û cezayê mirinê jê re hat birîn. 'Eliyê Kîmyewî' di sala 2010'an de hat îdamkirin.

**2017'an de weke 'Jenosîd' hat pejirandin**

Parlamentoya Îraqê piştî demeke dirêj, Enfal ku ji 86'an heta 89'an berdewam kir, weke 'Jenosîd' qebûl kir. Bexda di vê çarçovê de wê ji kes û karên qurbaniyan lêborînê bixwaze. Di heman demê de biryara zêdekirina Enfalê di nav mijarên pirtûkên dibistanan de jî hat girtin. Parlamentoya Îraqê ji bo ku Enfal di qada navdewletî de jî weke 'Jenosîd' were naskirin, dê dokûment û delîlên li ser jenosîdê bo gelek zimanên cîhanî werin wergerandin.

## "182 hezar qurbanî, 4 hezar gundên wêrankirî û bi hezaran koçber"

Di arşîvên Kurdistanê de hejmara qurbaniyan weke 182 hezar hatiye tomarkirin û di hin çavkaniyan de jî ev hejmar weke di navbera 100 û 150 hezaran de tê nîşandan. Piraniya wan zarokên keç, bi hezaran kes hatin windakirin, bi hezaran însanan koç kirin. Ji bilî kuştinên bi komî, bi deh hezaran însan jî neçar man ku ji cih û warên xwe koç bikin. 4 hezar gund hatin şewitandin, wêrankirin û jinavbirin. Bi hezaran sewalên kehî telef bûn, bi hezaran kîlometre zeviyên cotkariyê û daristan hatin texrîpkirin. Li herêmê hemû zindiyên li ser rûyê erdê ji holê hatin rakirin.

## "Wefaya herî mezin serxwebûn e"

Serokê Herêma Kurdistanê ku ji malbata xwe zêdetirî 8 hezar mêrên ji malbata Barzan di encama Jenosîda Enfalê de qurbanî dan, di salvegera Jenosîdê de soza Kurdistana Serbixwe da qurbaniyên Enfalê. Serokê Kurdistanê Barzanî ji bo Enfalê ev tişt anîn ziman: "Di salvegara 29. ya jenosîda Enfalê de ku li dijî zarok û pitikên xelkê me pêk hat de ruhê paqij yê şehîdên Enfalê û tevahiya Kurdistanê silav dikim. Ji kes û karên serbilind yên qurbaniyan re sersaxiyê dixwazim. Enfal ji bo dijminan û cîhanê rûpelek şermê ye û di laşê mirovahiyê û yên ku li hemberî vê jenosîdê bêdeng man de birîneke biêş e. Hewldan û xebatên danasîn û îtîrafkirina wê weke jenosîd bi cîhanê divê berdewam bikin û serbikevin. Teqez e ku hikûmeta Îraqê berpirsyarê kes û karên qurbaniyan e. Hikûmeta Kurditanê jî divê di xebata xwe ya anîna cenazeyên pîroz yên qurbaniyan bo axa welat û xizmeta xwe ya bo kes û karên şehîdan de divê her berdewam be. Sûcên li dijî zarokên miletê me pêk tên û sûcên li ser axa Kurdistanê rû didin, dokumentên zindî ne ji bo maf û daxwazên me. Divê dana ewqas qûrbaniyan bêencam nemîne. Wefaya herî mezin bo şehîdan avakirina pêşerojeke azad û serbixwe ye ku milet careke din rastî van sûcên mirovahiyê neyê û hemû pêkhateyên li Kurdistanê di bin Ala Kurdistanê de di nava aramî û biratiyê de bijîn."

# Duh ji Enfalê re, îro jî ji ya Êzîdiyan re bêdeng dimînin

**LÊKOLÎNER** û nivîskar Adalet Ömer Rahmanê ku bi lêkolînên xwe yên li ser komkujiya Enfalê tê zanîn ji heftenameya Basê re axivî. Rahman derheqê komkujiyê de agahiyên girîng parve dike. Rahman him balê dikşîne hewla Hikûmeta Iraqê him jî raya giştî ya cîhanê li ber komkujiya Enfalê ya ku 182 Kurd hatibûn qetilkirin...

Rahman diyar dike "Ji ber ku dewleteke Kurdan a serbixwe tune ye ev yek di qada navnetewî de dest û piyên me girê dide" dibêje û tiştê herî meriv li ber dikeve bêdengiya Enfalê niha jî ji bo Êzdiyên ku rastî zor û zextê DAİŞê tên derbasdar e…

Di 26ê Sibata 1988'an de Serokê wê demê Saddam Huseyn komkujiyek mezin li dijî Kurdan dabû destpêkirin. Di komkujiyâ ku 182 hezar Kurd hatibûn kuştin de, zêdetirîn 2 hezar gund jî hatibûn valakirin. Lêkolîner û nivîskar Adalet Ömer Rahman li ser vê komkijiyê lêkolîneke berfireh dike û di vê mijarê de bi sedan nivîs û berhemên wê hene. Rahman dibêje komkujî li gor planeke stratejîk pêk hatiye. Lêkolîner Rahman amaje dike ku ew di dema lêkolînên xwe de rastî gelek zor û zehmetiyan hatiye û niha belgeyên ku wê berhev kirine di dozan de têne bikaranîn. Ev xebat, di lêkolîn û tezan de hatiye bikaranîn. Rahman balê dikişîne ser berhevkirina zehmatiya dokumentan û wisa pê de diçe. "Armanca min a herî mezin ev e ku ez pêşengiya avakirina arşîveke netewî bikim û van hemû belgeyan li vir bi cî bikim bo milet û welatê xwe."

**"Ji sedî 80î gorên komî li ortê û başûrê Iraqê ne"**

Rahman balê dikişîne û dibêje salên borî gorên kesên ku di komkujiyan de hatibûn kuştin hatine dîtin û diyar dike ku gorên komî ji sedî 80î, orte û başûrê Iraqê ne. Pêvajoya lêgerîna goran wisa tîne ziman. "Piştî ku Rejîma Sedam hat ruxandin xebatên ku hatibûn kirin, ji ber bê hesasiyata Serdema Serokê Rêveberiya Iraqê ya Amerîkayê Paul Bremer, pişt re bê hesasiyata rêveberiyên Iraq û Kurdistanê herî dawî jî ji ber pirsgirekên ewlehî ên welatê me sekinîn. Bi tenê hestiyên 1920 kesan bi dest ketin. Ji ber şerê DAİŞê jî ev xebat bi temamî sekinî."

**"Îlankirina serxwebûnê mafê Kurdan e"**

Rahman amaje pê kir ku ew ne piştgirê hikûmeta Îraqê ye, saziyên navnetewî jî heta astekî piştgirî didinê lê ne bi giştî. Rahman biryara pesendkirina Enfalê wek Jenosîdê a Serdozgeriya Bilind A Îraqê jî nirxand û wiha got; "Biryara pesendkirina Enfalê wek Jenosîdê bêguman destkeftiya herî mezin e ji bo Kurdan. Ev dê qazancên mezin ji bo Kurdan bîne. Qirkirina Kurdan ji aliyê dewleta serdest ve mafê serxwebûnê dide Kurdan. Di derheqê Cihûyan de tenê carek bingeha jenosîdê heye. Lêbelê cihûyan ji bo dewleta xwe ava bikin vev baş bikaranîn. Di derheqê Kurdan de heta niha 6 Jenosîd rû dane û ev ji aliyê dîrokê ve hatine tomar kirin jî, lêbelê heta niha jî me ji vê yekê ti destkeftî wernegirtine. Ev yek jî cihê xemgîniyê ye. Hikûmeta Îraqê peywîrên xwe yên siyasî, exlakî û wijdanî bicih neanîn. Ne ziyan û êşên mexdûran ji holê rakirin û ne jî lêborîn ji keskarên qurbaniyan hat xwastin.

Rehman di qada navdewletî de jî ji bo danasîna Enfalê xebatên gelek girîng kirine. Di encama van xebatan de, di Lijneya Giştî ya NYê de li ser qebulkirina Enfalê weke jenosîd hate gotûbêjkirin. Jenosîda Enfalê di parlamentoyên Brîtanya, Kanada, Norweç, Swêd û Holanda û Parlamentoya Ewropayê de li ser hevdîtin hatinkirin û weke jenosîd hate qebulkirin. Rehman radigihîne, ji ber ku Kurdistan ne dewlet bû, nekarîne hin gavan biavêjin û wiha pê de diçe: "Ji ber ku em ne xwediyê dewleteke serbixwe bûn, me gelek astengî kişandin û me nikarî serî li her derê bidin." Rehman dibêje bêdengiya NYê di dema ku dema jenosîd pêk dihat de, bûye sedem ku jenosîd îro li dijî Kurdên Êzidî jî berdewam bike.

**Divê 'Saziya Arşîva Netewî' were avakirin**

Rahman radigihîne ku divê hevxemiya bo êşên mexdûrên Enfalê tenê bi merasîmên bîranînê sînordar nemînin û diyar dike ku jinavbirina bêedaletiya ku mexdûr rastî hatine, tespîtkirin û darizandina sûcdaran wê êşên kes û karên mexdûran sivik bikin. Rahman amaje pê dike, tevî ku di Hikûmeta Kurdistanê de Wezareta Şehîd û Enfalê heye jî xebatên wê têrê nakin û dibêje ku divê ji bo parastina hemû dokumentên li ser Enfalê 'Saziya Arşîva Netewî' were avakirin.

## Edalet Omer Rahman kÎ ye?

Edalet Omer Rahmandi sala 1970'î de li navçeya Hewlêra Rewandûzê hat dinê. Di sala 1974'an de wekî bi dehhezaran malbatên Kurd, wê û malbata xwe koçî Îranê kirin. Dibistana Seretayî, Lîse û Lîsansa xwe li Îranê temam kir. Di sala 1986'an bi awayekî çalak destbi xebatan kir û li herêma Erak a Îranê bo endamtiya şaxa jinan a koçberan hat hilbijartin. Di 1999'an de hat ser Navenda Lêkolînên Enfalê. Di salên piştî wê de jî di gelek saziyên ku di derbarê Enfalê de xebat dikirin de û di gelek xebatan de cih girt. Serdemekê di derbarê Enfalê de şêwirmendiya Hikûmeta Herêma Kurdistanê kir. Pirtûka Rahman ya yekem, "Lêkolînên li ser Dîroka Enfalê" di sala 2002'an de çap bû. Di 2003an de pirtûka wê, "Enfal û Jinên Kurd" û di 2004'an de "Zarokên Enfalê" hatin çapkirin. Ji bilî van pirtikûn bi dehan lêkolîn, xebat û lêkolînên wê hene.





NADÎRE GUNTAŞ ALDATMAZ

## Tirkê Almanya û Sîyaset

Kesê ke hetê rastê sîyasetî de dewamê falîyetanê xo kenê ekserîyet tersonek ê, ge henî yê ge nîyar ê, tim hetê menfatê xo der ê. Yanî bêîtibar ê. Coka ti nêzana ke key se kenê, key pey ra paşkule kewnê to ra.

Rojê ma odaya maliman de ronîşte îme, maliman ra o ke tewr fanatîk o, endamê Türk Eğitim Senî yo va "Ez her çîyê xo raste rast vana, ez kesî ra nêtersena." Vatena xo zî na bîye, va "Eke mumkun bo ez şona mezela Hîtlerî û ci rê sipasîya xo vana la karê xo nêmcet verda wo kaşka nê yahudî pêro qirkerdêne, biqedenayêne." Mi va "Birayê mi ti çayê bitersê, fikrê to be yê dewlete û îqtîdarî eynî yo. Zîyadeyê şarê Tirkîya zî sey to fikrîyeno. Coke kes to ra teba nêvano, sero zî to teqdîr kenê, ma ti çayê bitersê! Mi va, fikrê ma cesaret wazeno, yê to de çi esto! Yê ma derd tena derdê ma nîyo, ma derdê her kesî rê vêşenîme. Ma wazenîme ke her kes mesud bo, wa yahudî bo yan zî çi beno bibo wa însan bo bes o seba ma. Tena însan zî nê ma heqa heywanan zî pawenîme." Henî matê mi bî mend. Nika zî bîyo fênda tirkanê Almanya. Çîyo ke uca înan rê hometa, ê tîya ma rê kenê tomete. Uca xo rê demokrasî, heqa merdiman û huquq wazenê. Tîya nê heqan ma rê zêde vînenê, sero zî seba Tirkîya heqa înan a ray dayişî zî esta. Bixo tîya de nîyê la îradeya xo ya kanpereste tîya der a.

Almanya de nufusê maciran/multecîyan nêzdîye vîst mîlyonî yo. Nufusê Almanya heştay mîlyon ra zêde wo. Manayê ney zî no yo ke se ra vîzt-vîst dide yê nufusê Almanya macir o. Coka heme partîyê sîyasî yê Almanya wayîrê polîtîkayanê maciran ê. Merdim ke kampanyaya weçînitişanê Almanya de qayt bikero vîneno ke heqa maciran de polîtîkaya her partî zî esta. Nînan ra partîyê ke hetê çepî der ê, sosyalîst ê, sosyal demokrat ê yan zî komunîst ê tim leyê maciran der ê. Ê ke heto rast der ê, yanî ê ke miletperwer ê yan zî muhafezekar ê tim verê maciran der ê û nêwazenê ke macirî zî sey înan wayîrê heq û huquqê bibê.

Her hetê dinya de kesê sosyalîstî, sosyal demokratî yan zî komunîstî tim leyê kesanê bindestan yan zî leyê komelanê bindestan der ê, leyê mexduran der ê. Tim heq û huquqê înan pawenê. Coka zêdeyê tirkan ê ke Almanya der ê, rayê xo danê partîyanê sosyalîstan. Tena tirkî nê macirê bînî zî danê înan. La tirkî welatê xo de cîya yê.

Zîyadeyê tirkan ê maciran muhafezekar ê û ti ke ci ra bipersê xo sey dîndar name kenê. Çîyo ke ma domanînya xo ra be nat pîlanê xo ra heşna wo, gerek kesê dîndarî dahîna leyê mexduran de bibê, leyê mazluman de bibê. Labelê nê tim miletperwer ê û leyê dewleta xo der ê. Serê dinya de keso sey nînan temaşe çin o. Uca yew çeşît, tîya de yew çeşît ê.

Seke mi va macirî Almanya de zaf ê, nînan ra nêzdîyê çar mîlyonî kesî zî Tirkîya ra yê. Kurdî zî mabênê tirkan de saye benê, coka ez emîne nîya ke nînan ra çend kesî kurd ê. Çîyo ke ma zanenîme no yo: Wextê weçînitişî ke ame şar rayê xo Almanya de dano partîyanê sosyalîstan, Tirkîya de dano partîyanê muhafezekaran. Seke şima zî zanê nê her di fikrî yewbînan ra zaf dûr ê.

Muhafazakarê Almanya nêwazenê ke mileto xerîb bêro welatê înan, cayê înan teng bikero, karê înan destê înan ra bigîro. Nêwazenê ke nufusê xerîban bijedîyo. Çike tersenê, vanê nêbo rojê nê, na welat ma dest ra bigîrê, nêbo her cayê welatî de cinîyê çarşefinî bifetelîyê, nêbo ziwanê ma vîndî bibo. Vanê nêbo nê zor re ma bikerê, ma bi zor bikerê musluman û çsn.


Muhafezekarê Tirkîya zî eynî sey yê Almanya yê. Ez vana qey hetê xirabinîye ra pirenê înan ra aver ê. Çike muhafezakarê Tirkîya xo bi xo bîle tehamul nêkenê. Macirê ke yenê Tirkîya zîyadeyê xo musluman ê. Ancî zî tirkî ci rê dişmen ê. Keyeyanê înan vêşnenê, sey kole roşenê, karanê giranan de gurenenê û heqa înan ci nêdanê. Tim bi nefret qalê ci kenê. Heta seba nê nefretî macirî zî lazim nîyê, ê bînî, ê ke tirk û musluman nîyê, mesela armenîyê na welatî yan zî ma vajîme ala armenî her het ra sey dişmenî yenê qebulkerdene, kurdê ke musluman ê, ê bîle tena bes ê seba nefretê tirkanê muhafezekaran û miletperweran. Yew vateyo verên yê înan esto, vanê "Tirkî ra teber dostê tirkî çin o." Bi no kultur dişmenenî awan kerda, bi no tore domanê xo ê bînan rê kerdê dişmen.

Muhafezekarîye û neteweperwerîye her cayê dinya de eynî ya. Heme zî eynî çime ra, çimeyê tersî û nefretî ra benê weyîye û qetya dostê mazluman nîyê. Eke destebera ci bêro, paşkulê zî ê danê piro. Qet nêbo zî muhafezekarê Tirkîya nîya kenê.

Mi çayê qalê na mesela kerd? Mi waşt ke qalê karakterê komelanê aver nêşîyayan/pey de mendeyan bikerî. Çike însanê nê komelan muteberî nîyê. Ti nêzana ke key û kamcîn het ra şonê, ti nêzana ke key to ternenê, key pey ra danê to ro. Ti nêzana ke key to vejenê ser, key to erzenê erd.

nadirega@hotmail.com

# Şima Çira Kanser î?





■ ELÎDA ZERRÎ

**KANSER** çira hende bîyo zaf ? Ez şima ra pers kena! Şima xo rê tayê bifikirê. Ma her roj eşnawenê kê yew merdim bîyo kanser. Çira hînî her kes beno kanser?

Şima zaf mefikirê, ez şima rê vaja. Nika her çîyê ma bîyo kîmyewî, bîyo jehr. Werdê ma pêro bîyo jehr. Ma werdê tebîîyan ra dûrî mendî. Rûnê ma tebîî nîyo. Ma ganî werdanê xo bi rûno tebîî bipewjê. Labelê ney, mitbaxa ma de rûno tebîî çîn o. Mitbaxa ma de margarîn esta, pêro rûnê transî estê. Nîka mitbaxa ma de zey verî de rûnê dewê çîn o.

Ma her çîye xo hazir gênî. Herinda ke m abi xo virazê şonê her çî teber ra hêrîneni. Ma emeg nêdanî. Ma vanê wext ma çîn o, ma xebîtîyenî, ma nêeşkenî keye xo de biwirazî. Ma mastê xo, toraqê xo, salçayê xo hazir gênî. Şima bizanê kê; eke yew çî mîyane pakete/ambalajî de bo, o jehr o. Çimkî miyane ê çîyî de muheqaq madeya kîmyewî esta. Ma ganî teberî ra, marketan ra çîyêk nêherinê. Ma her çîyê xo dewê ra bîyarê yan zî dewîjan ra bigerî. Ma ganî hertim werdanê tebîîyan biwerê.

Ganî ma sewzî û meywe bazaran ra bigîrî. Labelê ney, ma şînî market û zimistan de zebeşî gênî û wenê, firing û îsotî wenê. Hamnan de zî porteqale gênî û wenî. Dima zî ma benî neweş. Ma benî kanser. Her çî wextê xo de weş o. Ê bînî pêro GDO yê, hormonin û jehr ê. Bedenê ma GDO û madeyanê kîmyewîyan qebûl nêkeno. Ganî her çîye ma sey bedenê ma tebîî bibo. Fitratê ma tebîî yo, bedenê ma tebîî yo, ganî werdê ey zî tebîî bibo.

Ma xo ra hes nêkenê, ma zaf bîyê rehet. Eke şima werdanê tebîîyan biwerê şima nêbenê kanser. Feqet tik û teyna bi werdan mesela safî nêbena. Keyeyanê ma pirrê deterjanan o. Deterjanî kîmyewî yê. Vere cû deterjan çîn bî. Sabunê erebî estbî, qarbonat û sîrke estbî. Ma bi înan paqijî xo kerdêne. Firaqê xo, kincê xo, porê xo ma deterjananê tebîîyan şuwetêne. Coka ma o wext zaf nêweş nêbîyêne.

Xora ma ganî deterjan nêherinê, pêro deterjanan ra dûrî vinderî. Çimkî deterjan jehr e, kîmyewî ye. Deterjanî ma kenî kanser, ma kenî astîm, ma kenî egzama û alerjî. Kozmetîk zî eynî hawa. Ma ganî pêro kozmetîkan re zî dûrî vinderî. Şampuano tewr rind sabun o, kremo tewr rind rûnê zeytunan o, parfumo tewr rind mîsk o, macûno didanano tewr rind karbonat o yan zî sol a. Yanî eke şima biwazê eşkenê her çîye xo çîyanê tebîîyan ra tercîh bikerê. Eke şima biwazê eşkenê xo pêro nêweşîyan ra bipawê.

Eke ma wina bikêrî ma emrê xo de qet nêweş nêbenî, qet îlacan nêşîmenî. Îlacî zî ma kenî nêweş. Îlac, yew cayê ma keno weş la des cayanê ma zî keno nêweş. Homa tebîet de her îlacî dayo ma, pêro îlacê ma tebîatî de estê. Şima ke Îbn-î Sîna biwanî, o wext mi fehm kenî. Îlacî kîmyewî yê û ma hêdî-hêdî kenê nêweş û peynî de kenê kanser.

Kapîtalizm ma nêweş keno û dima zî seba ke ma weş bê îlacan roşeno ma. No sîstem wina dewam keno. Sîstem wazeno ke ma bibê nêweş. Coka her cayê ma kerdê pirrê kîmyewîyan; werdê ma, deterjanê ma, kozmetîk û îlacê ma kerdê jehr. Ma netîce de xora bene nêweş, xora ma benê kanser.


Weşîya ma xemê kesî de nîyo. Doxtorî zî wazenê ma bibê nêweş, fîrmayê îlacan zî wazenê ma bibê nêweş. Çarxe dinya bin o hawa çêrexîyeno. Ganî m abi xo doxtorê xo bibê. Ma ganî çîyanê tebîîyan rav teber tu çî nêwerê û nêxebitnê. Şima mi rab bawer bikerê, key ke ma wina hereket kerd o wext ma qet nêbenê kanser. Şima o wext bilasebep meterse!

Wa çimê şima nêtersê, zaf zor nîyo. Mesela ez pêro wina kena, pêro werdê mi, deterjanê mi tebîî yê, merdim ke biwazo eşkeno sey mi bikêro. Verê her çî weşî muhîm a. Weşîya ma destê ma de. Mesele ez bi xo emre xo de qet nêşîya nêweşxanê. Çimkî mi va ya her çîye mi tebîî yo. Yanî her çi destê ma de yo, nêweşî zî weşî zî.

Ez şima ra rîca kena; xo ra hes bikê..! Werdê hol biwerê, werdanê tebîîyan biwerê. Bedenê xo rê îxanet mekerî. Qimetê ganê xo bizanê. Ma reyna nênê dinya. Weşîya ma ke destê ma ra şêra ma benê poşman. O wext ma se bikerê zî êdî erey o.

Ez coka vana qimetî xo bizanê. Eke şima xo ra hes kenê kîmyewîyan ra, radyasyonî ra, teknolojî ra dûrî vinderî. Radyasyon zî ma keno kanser. Telefon û cixarê zaf radyasyon vila kenî. Sey ê bînan telefon û cixare zî hertim destê ma de yê. Ma xo bi xo kenî kanser. Ma xo bi xo xirabê kenî. Çira ma xo ra hes nêkenî ? Her çî bi xo ra heskerdîşî ra dest pêkeno.

# Ingmar Bergman yan zî sînemaya heqîqetî




Ingmar Bergman, 14 temmuze 1918 de Swêd de maya xo ra bî. Lajê papazêkê prostestanî bî. Vera ey bawerî, sînorkerdişî û îradeyêko sey asin estbîy. Hêzo ke bîyo sebeb ke o cuye mehkeme biko pîyê ey bî. O hîç nêeşkayne bîrayê xo reyde pêbiko. Derheqê ey de vatêne "O bimerdêne seba mi hîna baş bîyêne". Na cumleya ey eslê ci de îfadekerdişê dejantişî bî; ey seba ke mîyanê înan de peywendîya (bağ) heskerdişî çin bî dej antêne. Bergman domanîya xo de timûtim vazdayêne û şîyêne maya xo het. "Mi waştêne ke maya xo het huzur bivîna." vatêne. Sînema de gama xo ya verêne pê kameraya ke ey rê ameybî dîyarî kerdêne eşte Bergmanî.

Cuya Bergmanî, mîyanê zehmetîyan û alozîyanê ruhîyan de vîyarte. Ey naye bi hawayo serkewte neqlê hunerê xo kerd. Bergmanî zaf zewacî kerdî û o çend rey aşiq bibî. Emrê xo de hertim hetê cinîyan girewt. Ey, ê hem kerdî qehramananê cuya xo hem zî yê fîlmanê xo. Gama ke merdim bi hawayo pêroyî biewnîyo fîlmanê ey ra, vîneno ke cuya ey, înan ser o tesîr kerdo. Bergamn, herçiqas seba ke herinda fîlmanê realîstan ê ke tede problemanê sosyalan ser o yenê vindertiş de fîlmê melankolîkî antene bêro rexne kerdene zî eşka nameyê xo neqşê sînemaya dinya biko. Ruh û persanê xo hende bi hawayo xorîn û tesîrin neqlê fîlmanê xo kerdbî ke temaşekerdoxê sînema kerdbîy mubtela. Serra 2005î de hetê kovara Tîmesî ra sey rejîsoro tewr gird yê dinya yo ganî ame weçînayene. Merdim nêzaneno gama ke merd cewabê persanê xo girewtî yan nêgirewtî mergê rîsipîyî ra feqet ma rê zaf persî ke erjê cewaban ê mendî fîlmanê ey ra.

*Rejîsoro ke sînema berz kerdo duştê sewîyeya edebîyat û tîyatroyî…* Kovara Time

*Ez hertim heyranê ey bîya, mi waşt û ceribna ke qasê ey rejîsorêko baş biba la no do tu rey rast nêbo.* Steven Spielberg

*"Xulasa bi o kaşo xorîn o ke nameyê xo "însan o"… Bergman tena seba ke girewto çimanê xo ver û ewnîyayo ê kaşî ra ke nameyê xo însan o ney, seba ke cesaret kerdo û ver bi cayanê tewr xorînanê ê kaşî şîyo war, eşkayo û destê xo panayo ruhê însanî ra zî rêjîsor û hunermendêko gird bî."*

Rejîsoro gird Bergman, fîlmê cuya xo 2007 de temam kerd û mîyanê ma ra şî. Ey şeştî ra zedêyêr fîlmî antî. Bi kilmîye fîlmanê ey de merdimanê demanê modernan ra vajîyeno ke hedîseyan ver remayene raşt nîyo eqsê ci ganî merdim înan reyde bêro têrî, merg û heqîqetî ser o bifikirîyo, muhakemeyan biko.

Şima eşkenê bi nê des fîlmanê ey ê weçînayeyan bivejîyê raywanîya heqîqetî:

1-Moro Hewtin, 1957 (Det sjunde inseglet / Yedinci Mühür)

2-Çime, 1959 (Jungfrukällen / Kaynak)

3-Bêvengîye, 1963 (Tystnaden / Sessizlik)

4-Roşnaya Zimistanî, 1963, (Nattvardsgästerna / Kış Işığı)

5-Persona, 1966 (Persona / Persona)

6-Yew Îxtîras, 1969 (En Passion / Bir Tutku)

7-*Qijîyî û Pistînîyî, 1972* (Viskningar och rop /*Çığlıklar ve Fısıltılar*)

8-Cuya Yew Zewacî ra Sexneyî, 1973 (Scener ur ett äktenskap / Bir Evlilik Yaşamından Sahneler )

9-Sonatê Payîzî, 1978 ( (Höstsonaten / Sonbahar Sonatı)

10-Fanny ve Alexander, 1982 (Fanny och Alexander / Fanny och Alexander)



Foto: Mutlu Can

# Edetêko balkêş

No fotografo ke şima vînenê, Qirxizîstan de ancîyayo û edetêkê balkêşî yê qirxizan nîşan dano. Qirxizî gama ke merdimê înan bivejîyê rayîrê dûrî û qezayê trafîkî ver bimirê; duştê ê cayî ke tede qeza bîyo û merdimê înan merdo, uca seba xatiraya ey/aye mezelêka sembolîke virazenê. Her serrgêra mergê merdimê/a xo de şonê a mezela sembolîke ser, ser o çîçêgan ronenê û bi no qayde yadkerdiş kenê.

# Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmancî (Zaza) -ÎKK- e. V. Berlîn

■ LERZAN JANDÎL*



LERZAN JANDÎL

**HERÇIQAS** ke seranê 80yî ra dime gelê kesî kirmanckî ser o gurîyêne, emeg dêne û no derheq de karê hêjayî kerdêne kî, karê kirmanckî hêna demê bulkî de bî. Her kes qasê îmkananê xo, qasê qewet û zanayena xo nê karî ser ro xebetîyêne. Karê kirmanckî û kirmanckî ser o gurîyene hêna nêbî bî wayirê dezgeyêde îlmî û dezgeyêde kolektîvî. Karî û xebatkarê nê karan jubînî ra cîya, vila û durî bîyî. Yanê karê kirmanckî hêna nêrest bî qonaxêde henên, ke wa hem îlmî, kolektîv û hem kî bîşîkîyo bireso şarê ma. No derheq de talîye de girse estbîye. Seba ke na talîye bêro pir kerdene, bi înîsîyatîfê hevalanê manê ke bi serran o kirmanckî ser o xebetîyêne, wayirê ked û emegî bîyî, sera 1999 de dest amê bi ci kerdene, ke wa ju dezgeyê zon (ziwan) û kulturê kirmanckî bêro ava kerdene.

Nê hêvalan (sere de –bi rêze- Aydin Bîngol, Çeko Kocadag, Daîmî Bektaş, Fîgene Kocadag, Hesen, Lerzan Jandîl, Munzur Çem, Selahattin Tahta, Wusênê Gestemerde, Xidir Kocadag û tayê kesanê bînan) gelê mordemê ke eleqadarê zon û kulturê ma yê, na derheq de kar û gureyê xo esto, wayirê emegî yê, silaynayî, înan de qesê kerd û seba dezgeyêde nîyanênî fikir û bawerîyê înan girewtene.

Tawo ke, zaf jubînî dîyenan û kombîyayişan ra dime, fikirê hevalan tayêna bî zelal, armanc û hedefî sereyê hevalan de tayêna nîştî ro, nê hevalan ra nêzdîye 20 kesî amayî pêser, fermî dest bi nê karî kerd.

Kombîyayişî 15.11.2000 de qerarê ava kerdena dezgeyêde zê înstîtutê amê dayene û hevalanê ke kar girewtbî xo ser, 18.12.2000 de seba avakerdişê Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmancî (Zaza) e. V. muracatê mehkeme kerd. Mehkemeyî 20.11.2001 de qerarê ava bîyena înstîtutî girewt û Înstîtut dosyaya komelan de amê qeyd kerdene û nîya bî fermî. Bêguman no mîyan de hevalê "verpersîyarî" kesanê bînan de kî kewtî têkilîye û nîya kombîyayişê newîyî kî viraştî.

Kombîyayîşê roja 14.07.2002yî ra dime komîteya rayeraberdişî qerarê cagirewtişî da û cayê amê kîra kerdene. No cawo newe kî roja 12.10.2002yî de bi programêde muzîk û kulturî bi rafîştena nîgaranê hunermendê manê Dersimijî Îbrahîm Coşkunî amê rakerdene. Bêguman rakerdişê Înstîtutî de çîyo tewr balkêş amade bîyena meymanan ma gelê roşnavîran, niviskar û rojnamevanan, şagirt û karkeran, cênî û camêrdanê kirmancan û kirdasan bîye.

Naye ra dime înstîtutî dest bi karanê xo yê taybetîyan kerd û na çerçewede derheqê Kirmanc û Kirmanckî de, derheqê zon û kulturê kirmancan de, derheqê dîrok û sarewedadayişê kirmancan de konferensî, panelî, semînerî dayî. Ancîya înstîtutî seba kirmanckî kursê zonî û derheqê gramerê Kirmanckî de semînerê ke çend rojan dewam kerdî, kerdî amade û nê kursê zonî bi seranê hêna kî dewam kenê.

Seba cande girewtena kulturê kirmancan, rojanê fîrazan û taybetîyan înstîtutî her sere xovîrîardişê nê rojan -zê vîrî ardena xoverdayena Şêx Seîdî, terteleyê Dêrsimî û Sêy Rizayî-; şandê kulturî, şahîya kulturî, konsertî -zê amade bîyena hunermendan û kesîtîyanê Kirmancan-; şandê wendene -zê roman, şîîr û hêketanê xo wendena niviskaran- organîze kerdî.

Înstîtutî seba ke Kirmanckî re şarê ma bidêro hes kerdene, alaqa dê bikero heşar, Kirmanckî wedene û nivisnayene teşwîq bikero, musabaqaya şîîr û hêketan viraşte. Ancîya seba ke ma Ewropa de cuyînîme, înstîtutî derheqê problemanê kirmancanê Ewropa de û çareserîya înan de semînerî, panelî viraştî. Înstîtutî bi nê karan kirmancî ardî tê lewe, derheqê probleman de ê kerdî heşar, kerdî şîrigê nê karî û bi naye kî rest Kirmancanê Ewropa.

Kaleka nê karanê înstîtutî de gelê endemanê înstîtutî kî gumra karê hêjayî kerdî. Çekî, Munzurî, Aydinî, Lerzanî 2002yî ra hetanî 2007î bi nameyê Înstîtutî kursê Kirmanckî dayî û nê kursî hêna kî hetê Lerzanî ra Berlîn de ênê dayene. Ancîya bi înîsîyatîfê endamê ma Aydin Bîngolî grupê de zê "atolyeya zonî" amê viraştene û naca de endamanê înstîtutî û hevalanê ma zon û problemanê zon û nivisnayene ser ro nêne were û na atoleye hêna kî dewam kena.

Her endamê ma karê zon û kulturê ma de aktîv o, xebetîno, gurîno. Tayê hevalê ma Grupa Vateyî de rê, zê Aydin Bîngolî, Çeko Kocadagî û Munzur Çemî.

Tayê hevalê ma rojnameyan û rîpelanê înternetî de nivisnenê, zê Îsmet Sîvereklîyî, Wusênê Gestemerde, Lerzan Jandîlî, Çeko Kocadagî, Munzur Çemî. Tayê hevalê ma karê kovara Vateyî gureto xo ser, zê verde Daîmî Bektaşî, nika kî Îsmet Sîvereklîyî. Tayê hevalê ma derheqê dîroka ma de nivisnenê, pirtukî vetê, zê Îsmet Sîverekîyî, Munzur Çemî, Özgür Barişî. Tayê hevalê ma kî çend karan pîya kenê, pirtukê gramerî, ferheng uêbînî vetê, zê Çekî û Munzurî. Tayê hevalê ma kî karê hunerî kenê, zê Sevgîye, Rindoyî, Pinare û Îmamî.Yanê bi kilmîye her endamê ma, beşê xo de xebetîno, dest ra çi êno keno û nîya kî berhemanê qencan dano.

Seranê pêyênan de înstîtutî giranîya xo dê karê perwerdeyî ser. Derheqê perwerdeyî de, ravê berdena metod û dîdaktîkanê perwerdeyî de, amade kerdena pirtukanê domanan de înstîtutî gelê karî kerdî.

Herçiqas ke karê amade kerdena pirtukanê domanan, yanê karê projekta "Wendene roştî ya" Kirdaskî "Xwendin ronahî ye" hetanî seranê 1990yî şona kî, taybetîye sera 2010 de bi înîsîyatîve Alan Dilpak û Lerzan Jandîlî na projekte rêyêna bîye cande û bi naye înstîtutî giranîya xo dê karê perwerdeyî ser.

Seranê 1990yî de projekta "Wendene roştî ya" kirdaskî "Xwendin ronahî ye" binê îdareyê Alan Dilpakî de dest bi amade kerdena pirtukanê domanan kerdbî. Lê nê pirtukî dizonkî nêbî. Yanê kirmanckî û kirdaskî bî. Nîya kî kirdaskî/kurmanckî "Xwendin ronahî ye", "Binêre! Binivîsîne! Birengîne!", "Pirtuka wêneyan bi ABC Kurmancî l-ll" û bi kirmanckî kî "Wendene roştî ya", "Nîyade! Binivisne! Birengne!", "Pirtukê wenêyan bi ABC Kirmancki l.ll" pîya amayî amade kerdene. Pirtukê kirdaskî/kurmanckî sera 1993 de hetê Weşanên Enstîtuya Kurdî ra amayî weşannayene. Lê weşannayena pirtukanê kirmanckî de problemî vejîyayî.

Naye ser o na projekte bîye vila. Lê sera 2010î de Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kirmancî (Zaza) –IKK- e. V. û YEKMALe (Yekîtîya Malbatên Kurdistanê li Berlîn) rêyêna bi înîsîyatîvê heval Alan Dilpakî dest bi nê karî kerd. Lê na şope gere materîyalî çerçeweyê ju projekte de hem kî dizonkî biyamêne amade kerdene.

Seba naye kî bineyê nameyê "Materîyalê musayişî yo dizonkî" de projekta kana seranê 1990î rêyêna amê ava kerde.

Kirmanckî "Wendene roştî ya" kirdaskî "Xwendin ronahî ye" û almankî kî "Lernen ist Licht" amê ava kerdene û prînsîbê na projekte kî o bî, ke her materîyal gerê hem bi kirmanckî-almankî û hem kî kirdaskî-almankî biyamêne amade kerdene. Yanê Alan Dilpakî nê materîyalî bi kirdaskî/kurmanckî-almankî û Lerzan Jandîlî kî kirmanckî-almankî kerdêne amade.

Amade kerdena pirtukanê domanan de armancê projete ê bî, ke wa:

1- Domanî hetê ra kesîtîya xo ya şarkî, zonê xo, kulturê xo bimusê û bi înan bibê pîl.

2- Domanî qedr û qîmetê derûdorê xo bizanê, resorsanê derûdorê xo bişinasnê û înan bi zanayiş bixebetnê û her çî ra ver kî seba generasîyonanê pêyênan biparezne.

3- Domanî kesîtîyêde demokratîk û humanîste ava bikerê, verhukman ra azad, duştê bawarîyanê bînan de û duştê şenikşaran û şenikdînan de bibê wayirê toleransî ya kî tolerant bê.

4- Domanî bişîkîyê xoser, tenya bixebetîyê, karê xo bikerê. Tenya girêdayîyê hetkarîya teberî mebê.

5- Domanî girêdayîyê şablonan mebê, bişîkîyê bifikirîye, fikirê xo bivajê û her çî ra ver kî bişîkîye kesanê bînan de binê were.

Lê seba ke mordem bireso nê armancan, gerê angoreyê nê armancan metodan bixebetno. Seba naye kî metodê ke ma nê materîyalan de xebetnayî, angoreyê nê armancan amayî weçînitene. Yanê nê materîyalî mîyan de sîmbolê şîdetî, sîmbolê verhukman, sîmbolê talan kerdena derûdorî re ca çînê bî.

Hevalanê ma A. Dilpak û L. Jandîlî na projekte de bi metod û dîdaktîkanê hemdeman, bi nîgar û resmanê rindekan, bi tekstanê angorê domanan, bi toşeyê rîpelanê zelalan pirtukê domanan kerdî amade û nêna kî kenê amede. Hetanî nika çerçeweyê na projekte de 8 pirtukî bi Kirmanckî û 8 pirtukî bi Kirdaskî amayî amade kerdene û pêro amayî weşannayene.

Çerçeweyê na projekta materîyalê musayişî yo dizonkî de pirtuko verên "Kermo Çimvêşan - Der gefräsiger Wurm", "Kurmê Çavbirçî - Der gefräsiger Wurm" Gulane 2011 de vejîyayî. Nê herdimîn pirtukî hem rengên û hem kî seba ke domanî birengnê, sîya sipê teba ju CDye amayî weşannayene.

Nê pirtukî ra dime bi rêze pirtukê "Xiznaya Çekuyan - Wortschätze", "Gencînîya peyvan - Wortschätze" I-II Eylule 2011 de, pirtukê "Hewnê Şîlane - Şîlans Traum", "Xwena Şîlanê - Şîlans Traum"

Mard 2012 de,pirtukê "Xiznaya Çekuyan - Wortschätze", "Gencînîya peyvan - Wortschätze" III-IV Eylule 2013 de, pirtukê "Çîroka beqikê Ceresunî - Die Geschichte vom mutigen Froschlein", "Çîroka beqokê Leheng - Die Geschichte vom mutigen Froschlein", Gulane 2015 de,pirtukê "Xiznaya Çekuyan - Wortschätze", "Gencînîya peyvan - Wortschätze" V Çelewo Qij 2016 de amayî weşannayene.

Karê na projekte hêna dewam keno û nika kaleka çend pirtukanê "Xiznaya çekuyan" zê sewze, kulînde de seba halênde domanan kî materîyalê musnayişî, yê ke amê amade kerdene, estê. Naca ez wazena derheqê pirtukanê Xiznaya Çekuyan de seba wendoxan, ma pîyan tayê haydarîya kilme bidêrî. Çerçeweyê projekta "materîyalê musayişî yo dizonkî" de hetanî nika 5 pirtukê amayî weşannayene.

Her pirtukî de name û nîgarê 12 heywanan û mêweyan estê û nê nameyî û nîgarî bi banderîyanê cudayan amê viraştene, ke wa doman bi zaf şopan tekrar kerdene, bişîkîyo înan ezber bikero.

Her banderîye hem sivik (nîgarê perî) hem kî giran(nîgarê kîloyî) ama amade kerdene. Zê xaçepersî, bi herfanê têmîyanan nameyan rast nivisnayene ûêb.

Seba ke pîlî, yanê ma û pîyî bê probleman, bê zametîye hetkarîya qijan bikerê, pêynîya pirtukan de cewabê banderîyan estê. Xêca cewaban pêynîya pirtukan de ferhengokêde qijkek kî esto. Nameyê heywanan almankî-kirmanckî (bi fekanê cudayan) û Kurmanckî amê nivisnayene.

Bi no qeyde kar û gureyê înstîtutê ma dewam keno. Hêvîya mi, waştena mi a wa, ke wa şarê ma înstîtutê ma rê karê ma rê wayir bivejîyo. Ma pêro-pîya ked û emegê xo biyarîme têlewe û nîya kî vereroje de berhemanê tewr xurtan bidêrîme.

*Serekê Înstîtutê Ziwan û Kulturê Kimancî (Zaza) –ÎKK- e. V.
Berlîn, 20.04.2017











Modela perwerdeya Mîrhat Tekîn bo zarokên otîstîk

# Bûye sedema kelecaneke nû!

**BENGÎ BAWEŞAN**

Mijara otîzmê gelek caran tê rojevê. Li van demên nêzik bo otîzmê bangewazî zêdetir tê kirin. Dibêjin berê ji hezar merivê yek, lê niha ji şêst û heyşt kesî kesek dibe otîstîk, gelo otîzm çi ye? Otîzm, piştî ku di mêjiyê merivan de xisar çêdibe pêkhateyên zarokan paş dixe û pêkhateyên wekî mêjî, ziman, femkirin, axaftin, dide sekinandin.

Mîrhat Tekîn ji Êlihê ye û Beşa Pêşveçûyîna Zarokan ya Zanîngeha Hacettepeyê xwendiyê. Tekîn, beşa ziman, axaftin û terapiyê li Zanîngehên UVic û Alcalâyê a Spanyayê xwendiye. Tekîn niha ji ber modela xwe ya bo perwerdeya otîzmê bala çapemeniyê dikişîne. Tekîn, bi vê modelê perwerdehiyê dide zarokan. Em bi Mîrhat Tekîn re li ser otîzmê û modela ku wî bi pêş xistiye axivîn. Tekîn pêşî qala sedemên otîzmê dike û dibêje tevî sedemên genetîk dema ku zarok zikê diya xwe de ji ber ku derman bi awayek zêde û şaş tê xwarin her wisa ji ber zirarên teknoliyê a faktora derdorî otîzm çêdibe dibêje.





Mîrhat Tekînê ji Êlihê ye û Pisporê Terapî û Axaftin û Zimên e. Li Spaniyayê di vê beşê de perwerdehî ditiye û piştî re hatiye Amedê. Mîrhat Tekîn dibêje di modela ku wî bi pêş xistiye de bi saya perwerdeya piralî û têrûtijî, zarokên fonksîyonên van zêde, zêdetirîn pak bûne.

**"Otîzm ne nexweşiyek e"**

Tekîn dibêje dê û bav zarokên xwe bila meze bikin û gelo zarokên van an otîstîk e an ne otîstîk e. Dema ku zarok dergûşiya xwe de nikaribin çavên diya xwe binêrin, ger nekenin û nelîzin ew yek dibin nîşaneya otîzmê. Her wisa dema ku zarok mezin dibin ger nikaribin xeberdin, tevgerên bê manê bikin, divê dê û bav ji van tiştan bikevin şikê û baldar bin.

Tê gotin ku otîzm bi dermanan nayê pak kirin ji loma jî ne di kategoriya nexweşiyê de ye. Tekîn dibêjê tevî bo pakkirina xisarên mêjiyê vîtamîn tê dayîn jî otîzm incax bi perwerdeyeke piralî û têr û tijê bê pakkirin.

Tekîn pênc sal berê hatiye Amadê û li wir bi cî bû ye. Sê sal berê jî dest bi perwerdeya zarokên otîstîk kiriye. Piştî ceribandina sê salan, salek berê jî li gorî modela Mîthat Tekîn dibistana perwerdeya taybet avakiriye. Tekîn patenta vê modelê bi dest xistiye û amaje dike bi saya vê modelê ji zarokên ku fonksiyonên wan zêde ne, pêşveçûyînek baş bi dest xistine. Heta hin ji van zarokan wek 'zarokên lihevanîn' dest bi dibistanê jî kirine. Tekîn heman demê dibêjê bi saya vê modelê jiyana zarokên otîstek yên fonksiyonên wan orte jî hinek baştir bûye. Fonksîyonên qels yên di zarokên giran de hê pêşveçûyînek nehatiye bi dest xistin.

> Modela Perwerdeya Taybet a Axaftin û Ziman a Mîrhat Tekîn ev demek e bala çapemeniyê dikşîne. Dibêjin ku vî modelî bo zarokên otîstik hêvîyek çê kiriye. Mîrhat Tekîn dibêje di dibistana ku wan vekiriyê de kontenjanên zarokan heştê ye û her wisa li dibistanê, di mehekê de heştê saet ders tê dayîn.

**"Divê perwerdeya zarokên otîzmê bi komxebatî bê dayîn"**

Tekîn diyar dike ku bo zarokên ne otîstîk gelek model hatine amade kirin û dibistan hatine avakirin. Tekîn dibêje cara ewil di modela wî de bo " zarokên otîstîk yên beriya dibistanê" perwerde tê dayîn. Zarokên ku ger bixwaze li gorî vê modelê perwerde bibîne divê ji test an jî azmûnên Modela Mîrhat Tekîn derbas bibe û asta wan diyar bibe. Pişt re bernameyek bi qasî bo çar mehan dest pê dike.

Tekîn bi vî awayî behsa modela xwe dike; "Niha li Tirkiyeyê ên perwerdeya otîzmê didin, di nav polên 10 metre kareyê de dersan didin. Heman demê gelek ders ji aliyê mamosteyekî tê dayîn. Em perwerdeyeke bi vî awayî bi rastî baş nabînin. Çimkî mamosteyek hemû beşan de ne mimkûn e ku pispor be, her wisa mamoste ji ber ku gelek diwestin wê demê jî nikarin baş dersan bidin. Divê perwerdeya otîzmê bi komxebatî bê dayîn."



**"Di mehekê de 80î saet ders didin"**

Tekîn destnîşan dike ku divê ev dibistan li gorî zarokên otîstîk bên dîzayn kirin.Tekîn diyar dike li gor modela wî bo zarokan pergaleke xwezayî amade dikin heman demê malbatên zarokan jî beşadarî vê pevajoya perwerdeyê dibin.

Tekîn wiha pê de diçe; "Di modela ku min pêş de biriyê de dibistan û pol weke ku zarok li malên xwe ne tê raxistin. Di dibistana me de pol di firehiya 35 metre kareyê de ne. Ji bilî vî amûrên her polê hene û ji hev cuda ne. Mamosteyên her dersê cuda ne! Niha sazî û dibistanên ku perwerdeya zarokên otîstîk didin, di mehekê de bi tenê heyşt saet ders didin zarokan. Bi rastî ev qas ders têra zarokan nake. Modela ku min bi pêş ve xistiyê de, dersên wekî psîko- motor, baldarî, ziman, axaftin, teqlîd, paqijî û amadehiya dibistanê têne dayîn û zarok di mehekê de 80î saet ders dibînin."

Tekîn, amaje dike ku divê zarokên otîstîk ji derdorên xwe îzole nebin ji ber vê yekê jî hin ajalan di dibistanê de xwedî dikin. Her wisa hin giya, fêkî û sewze jî li baxçê dibistana wan de digihêje.

**"Zarokên ku pêş ve diçin di heman demê de bo dibistanê jî amade dibin"**

Tekîn balê dikişîne ser armanca modelê û dibêje pêwîst e ku zarokên otîstîk beşdarî jiyana civakî bibin û bo vê yekê behsa girîngiya ziman dike.Tekîn diyar dike ger malbat kîjan zimanî bixwaze, yanê bi Tirkî an jî Kurdî ( kurmancî- kirdkî ) perwerdeya zarokan jî li gor vê bijartinê pêk tê. Tekîn dest nîşan dike ku li gor vê modelê divê zarokên otîstîk ên piçûk û ên mezin ji hev cuda bên perwerde kirin.Çimkî îxtîmala zarokên mezin hene ku him zirarê bidin xwe him jî zirarê bidin zarokên biçûk. Herwisa kontenjanên vê modelê jî heta heştê kesê/î ye.

Li gorî modela Mîrhat Tekîn perwerdeya zarokan li derveyî dibistanê jî tê kirin. Carinan hin mamoste diçin li malên zarokan û li wir ders didin wan. Tekîn wiha qala zarokên ku bi saya vê perwerdeyê pêş ve çûne dike; "Ger pêşveçûyîna mêjiyê zarokan hinek baştir bibe û femkirin, axaftin, hefizaya wan jî hinek dîsa pêş ketibe û bi tenê têkiliyên wan yên civakî qels mabe li gorî vê planek tê çêkirin. Li gorî vê digel zarokan diçin danûstandinê dikin, carinan li parkan ders tê dayîn. Ger me dît ku têkiliyên wan ên civakî pêş de diçin, êdî ev zarok dikarin wek 'zarokên lihevanînê' dest bi dibistanê bikin." Tekîn bal dikişîne ser girîngiya perwerdeyên zarokên otîstîk û dibêje lazim e ku dewlet piştgiriya aborî bide malbatên zarokên otîstîk."

Di modela ku Mîrhat Tekîn bi pêş xistiye de qala girîngiya malbatê jî tê kirin. Tekîn dibêje bo malbatan jî hin semîner û perwerdehî têne dayîn. Ji bilî vê Tekîn niha li ser beşa ziman, axaftin û terapiyê, lîsansa bilind dike. Di heman demê de derheqê vê modelê de niha pirtûkekê dinivîsîne.

> Di çarçoveya modela Tekîn de; dersên wekî psîkomotor, baldarî, ziman, axaftin, teqlîd, paqijî û amadehiya dibistanê têne dayîn. Li gor dersên vê modelê, hemû xwendekar yek û yek li van dersan ji her mamosteyekî/ê û di polên cuda de digirin. Malbat jî bi awayekî beşdarê vê pêvajoya perwerdehiya vê modelê dibin. Tekîn, patenta xwe ya vê modelê bi dest xistiye.

---



**JAN DOST**

## Sêwiyek li pêşangehê

Îsal bû nesîb me dîsa çavên xwe bi dîdara bejn û bala bilind a Kurdistana azad kil kirin. Dîsa berî mirinekê em çûn wê xaka ku ala rengîn li ezmanê wê bi azadî liba dibe. Bêhna azadiyê ji ya kulîlkên buhara deşta Hewlêrê, Şarezorê û çiyayên Gara û Metîn û Pîremegrûn û Şarezor bêtir difûriya.

Hewa xweş bû, ez bi dilekî geş mîna vê buharê bûme mêvanê pêşangeha navdewletî ya Hewlêrê û min serdana paytexta herêma Kurdistanê kir.

Bi rastî serdanek dewlemend bû. Rojên îmzê, semîner û korên wêjeyî, dîtina dost, xizm û hevalan, nivîskaran, wergêran û weşangeran. Wê ev dîmen ji her aliyê xwe de temam ba ku çavên min bi sêwiyekî neketiba. Sêwiyekî ku ez di pêşangehê de rastî wî hatim, dîtina wî kezeba min peritand.

Ji zû de min bihîstiye ku ew sêwî li welatê me heye û di nav kurdan de ye, lê min her digot ku xwediyên wî niha çêbûne û êdî hestên sêwîtiyê nema li gel wî peyda dibin. Min digot ku bi sedan kes jê re bûne bav û dê û êdî ew jî li her cih û warî serbilind û şanaz diçe û tê. Mixabin ne weha bû, dîmenê wî sêwîyî canê min tevizand û dilê min êşand.

Ez nizanim ji çi sebebê ji çi hoyê wisa lê hatiye? Lê min da dû meselê û pirsî. Dema ku helbestvanê kurd ê nazik Serkewt Resûl ez li gel xwe birim bîroya wezîrê Rewşenbiriyê (wezîrê çandê) Mamosta Xalid Doskî, piştî suhbeteke xweş derbarê edebiyat û qehweyek çêjdar min pirsa wî sêwiyê reben ji cenabê wezîr kir:

Gelo ji bo çi weşanên kurmanciya latînî nînin? Çima daweti pêşangehê nebûn ewqas weşanxaneyên kurmancî yên Kurdistana Bakur!

Wezîrê ku gelek kaxez û daxwazname li ber wî bûn û diva bû îmzeya xwe li bin wan deyne, li min nihêrî û ecêb ma, û tavilê bi ahengek pirsê got:

Nehatine? Çima! Her kes hatiye vexwendin.

Min gotê: Ezbenî ji Nûbiharê pê ve weşanxaneyên din kesek nehatiye.

Piştî hinek lêkolîn min nas kir ku weşanxaneyên Bakur ji xwe ber nehatine, her hinekan sebebekî wan hebû. Lê bi dîtina min nehatina wan şaşiyek mezin bû. Li paytexta Kurdistana azad, û di pêşangeha kitêban a navdewletî de peyva kurmancî nebe, yan bi awayekî hindik hebe bi rastî şerm e.

Cihê Avesta yê xuya bû. Xelkê pirsa pirtûkên kurmancî dikirin. Xwendevanên kurmancî êdî li wir zehf in. Bi baweriya min koçberên Rojavayê Kurdistanê dîmen guherîne. Weşangerekî kurmanc eger were dê ne poşman be. Min bi çavê xwe dît çawa xelk li dora standa Nûbihare kom dibin. Erê stand biçûk bû lê hebûna wê li wir hinek dilxweşî dida mirovan, hêvî li ba mirovan diafirand. Sêwîtiya kurmancî li pêşangeha Hewlêrê gelekî diyar bû lê bi saya hebûna Nûbiharê hinekî jana sêwîtiyê sivik bû, bi xêra xebatkarên Nûbiharê xwendevanên kurmancî pê hisiyan ku kesên guh li daxwazên wan dikin hene. Lê bi ya min Nûbihar hîç ne bes bû. Pirtûkên edebî, roman, helbestên nûjen, kurteçîrok dûrî destê xwendevanan man.

Weşanxaneyên kurmancî, diva bû bi çi awayî ba li wir amade bana, bila xesar jî bidana ber çavên xwe lê hema sûda herî mezin wê ew ba, ku kurmancî wisa sêwî nedima.

Bi hêviya ku sala bê rewş baştir be.

Fawaz Husên:

# “Eger ez ne nivîskar bûma, ez nizanim min ê çi xwelî li serê xwe bikira”



CIWANMERD KULEK




**Ez dixwazim bi babeteke ku di wêjeya te de her tim xwe dide hiskirin dest pê bikim: Bajarê ku tu lê çêbûyî. Amûdê ji bo te çi ye?**

Ez li gundê Kurdo, di destpêka nîvê duyem ji sedsala bîstan de, li dora Amûdê çêbûme. Ez heta 20 saliya xwe herdem li wan rast û navan bûm û paşê, çûme Helebê, Stockholmê û aniha jî li Parîsê me. Di gotarek xwe de bi navê «La lumière du Sud-Ouest», ango «Ronahiya rojavayê başûr», Roland Barthes dinivîse ku «tenê zaroktiya mirovan welatê wan e». Welatê min ne Sûriye û ne Kurdistan e jî, lê ew zaroktiya min a li Kurdo-Amûdê ye. Tiştekî din, Cioran dibêje ku «mirov ne di welatekî de, lê di zimanekî de dijî. Welat tenê ev yek e û ne tiştekî din e.» Ez dikarim vêga bêjim ku Kurdo-Amûdê û zimanê Kurdî ji min re welatek in.

**Te bi wî zimanî li ser wî gund û bajarî nivîsî û lehengê xwe Ferzendê Amûdê heta ber têlên sînor bir, lê nekarî wî derbasî nav tax û kûçeyên zarotiya wî bikî. Tenê bi xewn û xeyalan lehengê te dikare sînor derbas bike û xwe li nav bajarê xwe bibîne. Bi raya te, tu ê rojekê karibî wan sînoran bi awayê fizîkî jî derbas bikî?**

Tu behsa lehengê romana dawîn dikî, behsa lehengê « Heftiyeke dirêj li Amedê» dikî (Avesta, 2015). Bi baweriya min, pirtûk, çi roman, çi helbest, çi lêkolîn be, nikare – çiqas xurt be jî – ne çayekê ji mirovan re çêbike, ne du hêkan raqelîne û dinyayê ne xirab, ne ava, bike. Pirtûk, weke ku Jean-Paul Sartre di «Edebiyat çi ye» de dibêje, heye gava vekirî be û dibe weke pirekê û ew du mirovan, du jiyanan, digihîne hev. Lê bêyî wê jî, jiyan dibe. Ez berî du rojan çûme Almanyayê malên merivên xwe û min pirtûkek çi ye, ji bo dermanan jî, li ba wan nedît. Wan goşt û savara xwe dixwarin û ji sibehê heta nivê şevê li ber televizyonê rûniştibûn û behs û çêla pere û xanî û erebeyan dikirin. Gava min ji wan re got ku bêhtirî bîst berhemên min bi Fransî û bi Kurdî hene lê hîna xaniyê min ê bi kirê ye û erebeya min tune, hemûyan qerf û tinazên xwe di nava xwe de bi min kirin û diyar bû ku dilê wan bi rewşa min şewitî. Ez dizanim ku hemû rêzên berhemên min nikarin du buhist têlên hesin û xetek zeviyên mehînan ji sînorê li hember min û Amûdê rakin, lê ew rêz û ew nivîs li ber dilê min şêrîn in û alîkariya min dikin da ku ez jiyana xwe bi serbilindî bijîm. Weke ku ez herdem dibêjim, nîvê hezarî pênc sed e û di kû re zirav dibe bila biqete. Sînor çêbûne da ku mirov wan derbas bike û nivîsandin di vî warî de hîç bê kêmasî û bê qusûr e. Ew dikare heta sînorên mirinê jî dûr bixîne. Eger ez ne nivîskar bûma, ez nizanim min ê çi xwelî li serê xwe bikira.

**Te behs kir ku bêhtirî bîst pirtûkên te hene. Te beşek ji vana bi Fransî nivîsîne. Piştî ewçend salên li Fransa û ewçend pirtûkên ku te bi Fransî nivîsîn, tu Fransa jî wek welatê xwe û Fransî wek zimanê xwe dibînî?**

Ez bîst û sê salan li welêt jiyame, heşt salan li Swêdê (ji 1992an heta 2000î) û sî salên min li Parîsê buhurîne. Eger ez bêjim ku van sî salên dawîn tesîreke mezin li min nekiriye, nexwe ez mirovekî ji kevir im, an nan û xwêya min li ser kabokên min e û ez nankor im. Helbet Fransa jî, û zimanê wê, welatê min e, ligel ku ew ne yê zaroktiya min e. Ez nizanim bi rastî kîjan rojê û kîjan salê ez li Kurdoyê hatime dinyê, lê 28ê meha 8an sala 1978, ango roja hatina min a Parîsê, ji min re destpêka jiyaneke nû û serpêhatiyeke giranbuha ye. Tiştê ku Fransa ji min re kiriye tenê dê û bavê min ji min re kirine. Fransa rûmeta min dizane, alîkariya min û nivîsandina min dike. Roja ku dezgeheke kurdî rûmeta min bigre, min vexwîne pêşangeheke xwe an xelatekê bide min, ez ê wê gavê ji xwe bi guman bikevim û bêjim, belkî ez hatime firotin bêyî ku hayê min ji min hebe. Serbilindiya min a herî mezin ew e ku heta aniha sazgehên kurdî hîç guh li min nekirine û ez naxwazim bikin jî. Ez mirovekî serbixwe û azadê azad im û Fransa vê destûrê dide min. Ez bi zimanê Fransî dinivîsim û herdem zimanê min ê zikmakî di bîra min de ye. Ez helbet weke nivîskarekî Fransî ji Parîsê an ji Lyonê nanivîsim. Tenê edebiyatek fransî nîne lê bi sedan edebiyatên Fransî hene û ez beşdarî yekê ji wan dibim. Di hemû berhemên min ên Fransî de, Amûdê û doza Kurd û Kurdistanê hergav cihekî mezin dibînin. Ez edebiyatek kurdî bi zimanê Fransî diafirînim.

**Di çarçoveya vê edebiyata ku tu diafirînî de dixwazim çend tiştan bipirsim. Pêvajoya te ya nivîsîna berhemekê çawa ye, çi qonaxên wê hene, adet (“habitude”) yan rûtînên te yên nivîsînê çi ne?**

Bi rastî gava ez li berhemên xwe yên çapbûyî dinihêrim, ez matmayî dimînim ku min ew afirandine. Her berhem bi meh û salan di serê min de dimeye, amade dibe û weke zaroka ku gerek ji zikmakê derkeve ew jî di nav êş û xweşiyê de tê. Berhemek çi ye bi hêsanî nehatiye û erê destê min dikeve ser nivîsandinê, afirandin herdem karekî zehmet e. Weke nimûne, romana min a vê dawiyê, «Heftiyeke dirêj li Amedê» bi kêmanî du salan di serê min û di ruh û giyanê min de geriya beriya ku bibe berhem û li ser kaxez û rûpelan cih bigre. Hin nivîskar hene planan çêdikin û kêm zêde dizanin ê bi kîjan dawiyê rawestin. Ev yek hîç ji min re ne belî ye. Gava ez dinivîsînim, hemû roj û şevên min bi berhemê ve girêdayî ne, her gav li ser dixebitim û peyv li gorî lojîkeke taybet li pey hev rêz dibin. Weke vê hevpeyvînê, min nizanibû tu ê çi pirsan bikî, lê her pirsê, piştî çend kêliyan, gelek wêne û raman bi xwe re anîn. Tiştê herî girîng ew e çawan mirovê nivîskar ê bikare bi rêk û pêk van wêne û ramanan bihûne, li dû hev rêz bike û xwe dubare neke. Ez hîna jî li ser defterê, li çayxaneyên Parîsê, du sê rûpelan dinivîsim û bi lez vedigerim malê û ez bi komputerê li ser wan kar dikim û li ser wan ava dikim. Ez herdem pêşî bi pênûsê, li ser kaxezê, dinivîsim û dizanim ku ez berhemekê diafirînim. Helbet cadeya Champs-Elysées xweş e, seyranên li kêleka çemê Seinê dilrevîn in, bi taybetî şevên havînê, lê gava pelek li gora dilê min be, ew xweşiyek bêhtir dide min.

**Kêfa te ji kîjan nivîskaran re tê? Tu bawer dikî ku bandora hin nivîskaran li te dibe dema ku tu berhemekê diafirînî?**

Kêfa min ji wî nivîskarî re te ku gava ez berhema wî dixwînim, ez dibêjim: Xwezî min ev berhem nivîsandibûya. Bandora gelek nivîskaran li min bêguman heye çûnku ez di şikeftekê de najîm û ji babet û cûreyên nivîsandinê ne dûr im û bi rêk û pêk wan dişopînim. Xwendina min bêhtir bi zimanê Fransî ye, lê berê, gava ez li welêt bûm, min di zaroktî û xortaniya xwe de pir berhem bi Erebî ji edebiyata cîhanî xwendin. Di hemû salên ku ez li welêt jiyam, min tenê du pirtûkên bi Kurdî dîtin û min hewl da wan bixwînim, lê kurdiya min wan salan pir qels bû. Yek ji wan Rêzimana Reşîdê Kurd bû û ya din Memê Alan bû. Piştî ku min wêjeya Fransî li xwendegeha Helebê hilbijart û bi taybetî ji dema ku min xwendina xwe ya bilind li zankoya Sorbonnê li Parîsê qedand, hemû xwendina min bi zimanê Fransî ye. Bi baweriya min, yek ji nivîskarên Fransî yên herî mezin Louis Ferdinand Céline ye û bi taybetî berhema wî «Voyage au bout de la nuit», ango «Rêwiyita heta dawiya şevê». Pirtûka John Steinbek «Goşiyên xezebê» jî li min tesîr kir. Ez pir ji berhemên Albert Camus hez dikim. Van salên dawîn, ez pir edebiyata Amerîkayî dixwînim. Nivîskarê ku min jê hez kir Jim Harrison e. Weke piraniya Kurdan, ez ji wêjeya Amerîkaya Latînî hez dikim û wê nêzîkî xwe dibînim. Jixwe ez her sal li Don Kîşot vedigerim û dixwînim. Gava ez diherim pêşangeha pirtûkan a Parîsê, ez xembar vedigerim malê ji ber ku ez ji xwe re dibêjim: Xwedê, ewçend pirtûk hene ku ez ê nikaribim wan bixwînim. Helbet ez nivîskarên me yên Kurdan jî dixwînim û ji du salan ve li edebiyata bi zimanê Erebî jî vegeriyam. Ez aniha berhema duyem a Niroz Malek ji erebî dikim Fransî û gerek ev berhem îsal meha dehan derkeve. Bi baweriya min, nivîskar berî nivîskariya xwe gerek xwendevanekî bêhempa û mezin be, lê gelek ji me vê rastiyê di ser guhên xwe re diavêjin û di çarçoveyeke teng de dinivîsin.

**Bo pêşerojê, berhemeke bi Kurdî ku li ser dixebitî yan dixwazî binivîsî heye?**

Ji ber vê rewşa pir dijwar a li hember zimanê Kurdî, min tenê çar werger amade kirine, çar wergerên piçûk hem bo piçûkan, hem bo mezinan û bi hêviya ku li ba Avestayê çap bibin. Bi rastî, piştî ku qutiya berhemên min en giştî derket, ez dikarim hinekî xwe ragirim.

**Tu pêşeroja (ayindeya) zimanê Kurdî çawa dibînî?**

Zimanê Kurdî di van sî çil salên dawîn de gavên pir mezin avêtin û gelek berhemên wê ne kêmî yên berhemên cîhanî ne. Lê mixabin di van çar pênc salên dawîn de rewşa zimanê Kurdî pir dijwar e û bi rastî, pir kêfa min tê ku tu serê xwe bi wêjeya Kurdî diêşînî û hêviya xwe jê nabirrî. Va bi saya te ez hinekî li nivîsandina bi Kurdî vegeriyam.

**Xeyala te ya mezin çi ye ku te dixwest rojekê bi çavên xwe bibînî ku bûye rastî?**

Weke min got, zimanê Kurdî weke gelek zimanên din nemir, hîna li ser piyan e û ev yek ji min re şanaziyeke mezin e. Ma ku zimanê Kurdî çû çi ê ji me re bimîne? Ew tenê me ji hemû miletên navçeyê cihê dike. Ji ber vê yekê ez dîn dibim gava ku Kurdên me serên xwe bi zimanekî din, zimanekî dagîrker, bilind dikin. Ji bo min bi xwe, min jî çend gavên mezin avêtin, bi Fransî û bi Kurdî nivîsî. Ez bi henekî dibêjim, min li dora 15 sentîmetran û hezar rûpel li wêjeya Kurdî zêde kirin û wisa jî li ya Fransî. Gotin koro te çi divê, got çav. Ez jî çavekî mezin, xweşik û dilovan ji edebiyata gelê xwe re, gelê Kurd re ha, dipêm.

Fawaz Husên bi gilî ye, bi gazin e lê bi hêvî ye û berdewam bi eşq dinivîse. Heta niha tibabek kitêb diyarî ziman û edebiyata Kurdî kirin, kitêbên ku her tim “hesret”ek, “kul”ek di naxa wan de heye. Kêm kesî karî wek wî vê kul û hesretê di kirasê hûmor û îroniyekê de hilîne. Şeş meh berê, dema me li Parîsê hevdu dît û wî rojeke xwe bi qedirgirî ji bo min terxan kir, ez li kûçe û kolanên vî bajarî gerandim, min ji nêzîk de pêjna wî ruhî kir ku ji Parîsê çîroka Amûdê dirist, kûçe û kolan û mal û xelkên wê, gundê Kurdo, hevok bi hevok di romanên xwe de ava dikir. Ne diyar e ew ê rojekê karibe vegere Amûda xwe ya şewitî yan na, lê teqez e ku wî di stargeha zimanê xwe, bîranînên xwe û afirandinên xwe de welatê xwe ji zû de peyda kiriye.



# Li Almanyayê perwerdeya zimanê dayikê û rewşa dersên Kurdî

ŞEFÎQ PÊŞENG




KOMKAR (Federasyona Komeleyên Karkerên Kurdistanê) di komcivîna xwe ya sala 1980'î de mijara dersa Kurdî xiste rojeva xwe û piştî komcivînê bi van daxwazan dest bi kampanyayekê kir: Li xwendingehên fermî dersdayina Kurdî, Di radyo û televizyonên dewletê de weşanên bi Kurdî, di saziyên şêwirmendiyê de şêwirmendî û refaqeta bi Kurdî.

Her çi, hêj di dawîya salên 1800'yî û destpêka salên 1900'î biyanî hatibin Almanyayê jî bi şêweyek girseyî di destpêka salên 1960'î de ji gelek welatan însan ji bo kar hatin Almanyayê. Gelek bajarên Almanyayê di Şerê Cîhanê yê Duyem de wêran bûbûn, bi milyonan mêrên Alman di şer de hatibûn kuştin, bi dehhezaran dîl ketibûn, ewqas kes jî ji ber şer Almanya terikandibûn. Li ser vê yekê bi milyonan karkeran berê xwe dan Almanyayê.

**Kurteçîroka xebatên di derbarê dersên zimanê dayikê de**

Piştî hatina hejmareke zêde ya koçberan pirs û arîşeyan jî dan der. Yek ji van jî pirsa perwerdeya zarokên van karkeran bû. Li ser daxwaza rêxsitinên penaberan û piştgiriya GEW(Sendîqaya Mamosteyan) û DGB(Hevgirtina Sendîqayên Alman), hikumeta federal di 25.07.1977'an de biryarnameyeke ku rê li ber dersên zimanê dayikê vedikir derxist û bicîhanîna wê spart eyaletan. Di 1978'an de li xwendingehên Alman dersa Tirkî dest pê kir.

Di eniya Kurdan de jî KOMKAR (Federasyona Komeleyên Karkerên Kurdistanê) di komcivîna xwe ya sala 1980'î de mijara dersa Kurdî xiste rojeva xwe û piştî komcivînê bi van daxwazan dest bi kampanyayekê kir: Li xwendingehên fermî dersdayîna Kurdî, di radyo û televizyonên dewletê de weşanên bi Kurdî, di saziyên şêwirmendiyê de şêwirmendî û refaqeta bi Kurdî.

Hêj di destpêkê de KKDK(Federasyona Komeleyên Karkerên Kurdistanê yên Demokratîk-niha Civata Kurd li Almanya) û UDK(Yekîtîya Demokratên Kurdistanê) bûn şirîkên vê kampanyayê û kampanya bi hev re hat meşandin. Piştî du salan yekta hevgirtina saziyên penaberan BAGIVê ku saziyên Ermenan, Yûnaniyan, Asûriyan, Spaniyan, Yoguslaviyan, Tirkan û Kurdan endam û damezrênerên wê bûn, hat damezrandin. BAGIVê di komcivîna xwe ya duyemîn de daxwaza mafê dersa Kurdî xist bernameya xwe. Li ser vê yekê saziyên Tirk ku nêzî Partîya Komunîst û CHPê bûn, ji BAGIVê veqetiyan.

Di vê demê de hemû xebat û serlêdanên di vê derbarê de rastî midaxale û rêgirîyên konsolosxane û saziyên Tirk dihatin. Di destpêka salên 1990'î de YEK-KOM (Niha NAV-DEM- Navenda Civaka Demokratîk ya Kurdên li Almanyayê) jî bi aktîfî tevlî vê xebatê bû. Bi beşdarîya NAV-DEMê xebatên bo bidestxistina mafê dersa Kurdî bihêz û berfirehtir bûn û yekem car di dersala 1992/93 de li bajarê Bremenê li du xwendingehên seretayî ders dest pê kir. Dersdarên pêşî jî Mamoste Emin Akbaş û Suleyman Gulpinar bûn.

**Statûya dersa zimanê dayikê**

Qanûna mafê dersa zimanê dayikê teqez dike ku ji bo hemû zimanan e. Tenê li NRWê(Westfaliya Bakurê Renê) ji bilî Kurdî bi gelek zimanan ders tên dayîn û ev ders ne mecbûrî ne û bi hin mercan ve hatine girêdan. Herwiha şertên her eyaletekê ji hev cihê ne. Ka em li ser NRWê rawestin:

-Xwendekarên pola 1. heta pola 10. mafdar in beşdarî dersan bibin.

–Ders li hemû formên xwendingehên fermî tên dayin.

–Ji bo komikên xwendingehên seretayî 15 xwendekar û bo xwendingehên dinê ( polên 5-10) 18 xwendekar pêwîst in.

–Naveroka dersan ji aliyê wezareta eyaletan ve tê amadekirin

–Li gorî şert û mercan heftê herî kêm du û herî zêde pênc saet ders tê dayin.

–Kadroyên mamosteyan ji alîyê Wezareta Perwerdê ve tên diyarkirin û mamoste ji aliyê hikumeta herêmî an jî Daîreyên Perwerdeyê yên Bajaran ve tên hilbijartin û tayînkirin.

**Rewşa Dersên Kurdî**

Li gel hikumeta federal bi biryarnameyekê rê li ber dersên zimanê dayikê vekir jî hin eyaletan ji bo dersên zimanê dayikê çi amadekarî nekirin.

Ku em behsa perwerdeya Kurdî dikin, divê bê destnîşankirin ku di rastiyê de ders bi zaravayê Kurmancî têne dayin. Tenê li Kolnê mamosteyek bi Soranî ders dide. Heta niha li Almanyayê li xwendingehên fermî dersa Dimilî/Zazakî nehatiye dayin.

**Li Almanyayê niha li van eyalet û bajaran dersên Kurdî têne dayin:**

**NRW:**

Bonn, Koln, leverkusen, Wuppertal, Essen, Duisburg, Oberhausen, Bochum, Herne, Dortmund, Wesel (Voerde û Dinslaken jî di nav de), Munster û Bilefeld. Li van bajaran 11 mamoste ders didin.

Niedersachsen(Saxsina jêrîn) :

Klopenburg ,Wildeshausen, Oldenburg, Hannover, Celle, Peine, Osterholzschamberg û Achim.

Li vê eyaletê xwendekarên polên 1- 4 dikarin beşdarî dersên Kurdî bibin, kom ji 11 xwendekaran pêk tên û heft mamoste ders didin.

**Bremen:**

Li bajarê Bremenê ku bi serê xwe eyaletek e, xwendekarên polên 1-6 dikarin beşdarî dersên zimanê dayikê bibin û li vê derê du mamoste dersa Kurdî didin.

**Hamburg:**

Li Hamburgê ku ew jî him bajar û him jî eyalet e, xwendekarên polên 1-6 dikarin beşdarî dersên zimanê dayikê bibin û li vê derê mamosteyek dersa Kurdî dide.

Li van bajar û eyaletên navborî, dora 2 hezar û 100 xwendekar beşdarî dersên Kurdî dibin. Bêguman astengiyên teknîkî, plansazî û birêkûpêkkirinê hene. Lêbelê dema em hejmara xwendekarên beşdarî dersa Kurdî dibin û gelheya Kurdên li Almanyayê didin ber hev, ev hejmar ne hejmareke ku meriv pê serbilind bibe ye û sedema sereke jî xemsarîya Kurdan bi xwe ye. Di derssala 2016/17an de li seranserê Almanyayê 21 mamosteyên Kurdî ders didin, lê tenê li NRWê dora 800 mamosteyên Tirkî hene û derdora 90 hezar xwendekarên Tirk beşdarî dersên Tirkî dibin.

**Pêşwendiyên dersa zimanê dayikê**

Ji bo xwendekar beşdarî dersa Kurdî dibin, ji dersên xwe yên dinê namînin. Dersên zimanê dayikê dema ku dersên din qediyan dest pê dikin. Dema ku ders qediyan divê xwendekarên Kurd beşdarî dersa Kurdî bibin.

Her xwendekar ji pola 3ê û pê ve ji bo Kurdî jî notekî distîne. Ev not tevî dokumenteke beşdarîyê li bawernameyan tê nivîsandin û beşdariya derseke bidil bo her xwendekarekî diyardeyeke qenc e. Xwendekarên Kurd dikevin azmûna Kurdî jî û eger Îngilîziya wan ne baş be, bi noteke baş ya Kurdî dikarin xwendina xwe biqedînin.

Eger şert û mercên teknîkî û cih û peydakirina mamosteyan, bêne bicîhanîn, dê xwendekarên Kurd bikaribin di pola 7an de Kurdî weke zimanê biyanî yê duyemîn an jî sêyemîn hilbijêrin. Hêj ev maf nehatiye bikaranîn.



Li bajarên Bonn, Koln, leverkusen, Wuppertal, Essen, Duisburg, Oberhausen, Bochum, Herne, Dortmund, Wesel (Voerde û Dinslaken jî di nav de), Munster û Bilefeldê 11 mamoste ders didin.



Ku em behsa perwerdeya Kurdî dikin, divê bê destnîşankirin ku di rastiyê de ders bi zaravayê Kurmancî têne dayin. Tenê li Kolnê mamosteyek bi Soranî ders dide. Heta niha li Almanyayê li xwendingehên fermî dersa Dimilî/Zazakî nehatiye dayin.

---



FIRAT CEWERÎ
Nivîskarî

Min berî bi salan ev aforîzmaya ha nivîsandibû: "Nivîskarî nexweşiyek e, ji nexweşiyê jî wêdetir wek vîrusekê ye, di hemû laşê mirov de digere û heta mirinê dev ji mirov bernade." Nivîskarî bi rastî jî celebeki nexweşiyê ye. Yê/ya ku bi nexweşiya nivîskariyê dikeve heta mirinê jê pak nabe. Mirov di pêvajoya jiyanê de dikare xwe biguhere, kar û mijûliyên xwe biguhere, stîla xwe biguhere, fikrên xwe ên siyasî biguhere, kar û pîşeyên xwe biguhere û dev jê berde, lê mirov nikare dev ji nivîskariyê berde. Dibe ku di pêvajoya nivîksariyê de mirov dev ji hin şaxên edebiyatê berde û derbasî şaxin din bibe, mirov dikare stîla xwe ya nivîsandinê biguhere, lê mirov nikare bi temamî dev ji nivîskariyê berde. Ji ber ku nivîskarî ne mîna kar û pîşeyên din e. Mirov nikare bibêje ez ê filan dibistanê bixwînim da ku ez bibim nivîskar. Nivîskarî ji nişkê ve û bi carekê ve li mirov eyan dibe. Mirov xwe bi carekê ve di nav cîhana xeyalan de dibîne. Mîna ku dengek di guhên mirov de dike pistinî û dibêje; de binivîse! Ên ku ew deng xwe dirêjî guhên wan dike, dinivîsin. Ew nivîsandin paşê dibe wek kurmekî. Ew kurm ji bo hinan kişandina cigarê, ji bo hinan vexwarina alkolê, ji bo hinan dewlemendî, ji bo hinan mal û milk, ji bo hinan evîndarî be, jibo nivîskar gotin in. Ew gotinên nihênî ne ku li nivîskaran eyan dibin, nivîskar jî bi hûnandineke taybetî radigihînin me.

Em dizanin ku gelek nivîskar ji tenêtiyê hez dikin, xwe ji civatê vedikişînin û dikişin qalikê xwe. Ya rastî ne ku ew dixwazin ji mirovan birevin, lê ew dadigerin cîhana xwe ya hundirîn ku ew cîhan tije mirov û tevgerên wan in. Loma, ew ne bi çavekî normal berê xwe didin civata me, lê ew bi çavên xwe li civatê û mirovên wê dinêrin. Tiştên ku her kes nabînin, nivîskar dibînin; tiştên ku ew dibînin, ew ne mîna her kesî dibînin. Ew mîna xwe dibînin, kiraseki din lê dikin û bi awayekî din dewrî me dikin. Ew keçekê ne wek me, lê wek xwe dibînin. Ew bi çavekî din li mêrekî dinêrin. Parsekekî ku destê xwe vedigire, ji bo wan ne bi tenê parsekek e. Ew bi pîranî di cîhana xeyalan de dilivin. Her tiştên ku ew dinivîsin ne rast in, lê ew derewên xwe ji rastiya heyî rasttir dixemilînin. Ew ji çend mirovan miroveki tînin pê, ji çend bajaran bajarekî; carina çend fikran di fikrekê de dicivînin. Ji bo nivîskaran xwarin û vexwarina wan, kêfxweşî û xemgîniyên wan, jîrî û jariya wan, hebûn û nebûna wan afirandina wan e. Ew hin mirovan ji nû ve diafirînin. Gava mirov dixwîne, mirov bi wan karakteran re dijî, mirov bi kêfxweşiya wan kêfxweş, bi xemgîniyên wan ji xemgîn dibe. Ji ber ku nivîskar afiranderê wan karakteran e, loma, ew wan karakteran ku ji tunede ava dikin, dişibînin xwe. Ew hinekî ji fikir û jiyana xwe tevlê dikin. Gava ew vê dikin, ew hinekî xwe dispêrin kitêbên pîroz û dibêjin; gava Xwedê insan afirandine, Wî insan şibandine xwe. Ew jî xwe dikin Xwedayên karakterên xwe. Loma bi riya wan jiyan û cîhaneke nû pêşkêşî me dikin. Ew kelekê li jiyana xav dixin, bi tehmtir dikin û didin me. Bi xêra jiyan û cîhana ku ew pêşkêşî me dikin, jiyan û cîhana me jî tê guhertin. Loma karê wan ne mîna karê doktorekî, mamosteyekî, terziyekî, karmend, an jî qesabekî ye. Ew nikare bibêje ez îro heşt saetan xebitîm û dive ez dikana xwe bigirim. Ne şev ji wan re heye, ne jî roj. Ew dikare şev nîvê şevê ji xewê bipengizin û çend gotinên din li cîhana xwe ya hundirîn zêde bike. An jî ew li rawestgehê dikarin pêrgî mirovekî an mirovekê bên û pê tevger, liv, peyv û hisên karakterên xwe tekûztir bikin. Ew carina dikarin xwe bi xwe bipeyivin. Lê ya rastî ew ne xwe bi xwe dipeyvin, ew hingî dageriyane cîhana xwe ya hundirîn, an jî ew di cîhana xeyalî de bi karakterên xwe re ketine guftûgo û sohbetê. Ji ber ku ew bi wê riyê dixwaze mirovê ku ji tune de afirandine bişibîne me. Ew nav lê dikin, dixin tevgerê û radigihînin me. Karakterekî ku bi destên nivîskaran tên afirandin, ji mirovên rastî bêtir dijîn. Temenê karakterekî dikare sed sal, du sed sal û hezar sal be. Bi gotineke din karakterên ku ji xeyala nivîskarên hoste hatine pê, nemir dibin.

Erê, nivîskarî nexweşiyek e, nivîskar nikare dev jê berde, lê belê carina nivîskarî dev ji nivîskêr berdide. Carina nivîskar dike nake karakter bi a wan nakin. Carina ew ziwa dibin û ew cîhana wan ya xeyal û afirandinê vikî vala dibe. Ew dikin nakin nikarin du gotinan bînin ba hev. Ev tirsa nivîskar ya herî mezin e, ji bo nivîskar ev yek mirin e…